



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind

LATÎNÎZEYA “DÎWANA KARÇIKANÎ” YA MELA ENWERÊ OVANISÎ

Seher BÎŞAROĞLU
20721006

Şêwirmend
Dr. Shahab VALÎ

Mêrdîn-2022



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind

LATÎNÎZEYA “DÎWANA KARÇIKANÎ” YA MELA ENWERÊ OVANISÎ

Seher BÎŞAROĞLU
20721006

Şêwirmend
Dr. Shahab VALÎ

Mêrdîn-2022

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Latînzeya “Dîwana Karçikanî” ya Mela Enwerê Ovanisî**” adlı projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

/02/2022

Seher BİŞAROĞLU

KABUL VE ONAY

Seher BİŞAROĞLU tarafından hazırlanan “Latînzeya “Dîwana Karçikanî” ya Mela Enwerê Ovanisî” adındaki çalışma, tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS PROJESİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

PÊŞGOTIN

Edebîyata Kurdî her roj pêşve diçe û kamiltir dibe. Roj bi roj berhemên Kurdî ji tarîtiyê xelas dibe û ji bo hezkiriyên edebîyata Kurdî têne pêşkêşkirin. Bi hewla ev xebatên ku têne kirin perdeya li ser edebîyata Kurdî radibe û gencîneya zimanê Kurdî derdikeve holê.

Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî yek ji wan edîbên Kurd e ku heta niha nehatiye nasîn û di lîteratura Kurdî de jî nayê zanîn. Mela Enwer di sala 1951ê de li Ovanisa Tetwanê hatiye dinyayê û bi salan melatî kiriye û hêj li heyatê ye. Heta niha ti xebatên akademîk li ser wî û berhemên wî nehatine kirin. Em bi saya Abdullah Akbaşê neviyê Mela Yasîne Alikî hay ji Mela Enwer çê bûn. Piştî hevpeyvînê em hîn bûn ku Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî jî xwedî dîwançeyêke Kurmancî ye.

Mela Enwer ji berhema xwe re navê “Dîwana Karçikanî” danîye, lêbelê ev berhem ji aliyê hecm û tertîba xwe ve ne dîwaneke mureteb e û dîwançeyek e. Hemû helbestên di dîwançeyê de bi malikan hatiye nivîsîn û tê de 16 helbest cih digirin û zimanê berhema wî Kurdîya Kurmamncî ye. Helbestên di dîwançeyê de bi terza helbesta klasîk hatine nivîsîn û mehsûleke çanda medreseyan e. Em dê di vê xebata xwe de kurtejiyana Mela Enwerê Ovanisî bidin û dê xebata me bi berfirehî li ser latînzeya Dîwançeya wî be.

Bi saya vê xebatê dê ev berhem jî têkeve lîteratura Kurdî û dê ev berhema ku bi terza klasîk hatiye nivîsîn bi herfên transkripsiyonê weke latînî bigihêje ber destê lêkolanan.

Di amadekirina vê metnê de ji bo şewrimendîya Shahab Valî spasîyên xwe pêşkêş dikin. Herwiha ji bo alîkarîya giştî ji bo M. Zana Karak jî spasdarin û em ji Mela Enwerê Ovanisî re jî spasdar in ku hişt em li ser dîwançeya wî bixebitin û di vê mijarê de agahî bi me re par ve kiriye.

KURTE

Mela Enwerê Ovanîsî yê Karçikanî di sala 1951ê de li gundê Ovanisa Tetwana Bedlîsê hatiye dinyayê. Bi salan li gundên Wanê û li Edeneyê melatî kiriye û di medreseyan de feqî perwerde kirine. Mela Enwer jî bi terza klasîk dîwançeyeye helbestan nivîsîye.

Di vê xebatê de li ser latînîzekirina Dîwançeya Mela Enwerê Ovanîsî yê Karçikanî hat rawestan. Dîwana Mela Enwer berîya niha bi awayekî amatorî bi tîpên Erebî hatiye çapkirin. Lê heta niha bi tîpên Kurdî-latînî nehatiye nivîsîn. Herwiha heta niha di lîteratura Kurdî de Mela Enwerê Ovanîsî yê Karçikanî û berhemên wî nehatine nasîn. Di vê xebatê de bi kurtasî jîyana Mela Enwer hate dayîn û dîwançeya wî jî bi herfên transkîrîpsiyonê hatiye latînîzekirin.

Peyvên Sereke: Mela Enwer, Dîwançe, Karçikanî, Latînîze, Edebîyata Klasîk

ÖZET

Karçikan (Reşadiye) bölgesinden Ovanıslı Molla Enver Esen, 1951 yılında Bitlis'in Tatvana baęlı Kurukaya (Ovanis) köyünde doğdu. Van'ın köylerinde ve Adana merkezde de uzun yıllar imamlık ve müderislik yapmıştır ve medreselerde eğitim vermiştir. Molla Enver'in ayrıca klasik tarzda bir şiir divançesine sahiptir.

Bu çalışmada Ovanıslı Molla Enver'in Divançesinin latinizesi üzerine durulmuştur. Daha önce Molla Enver'in bu divançesi amatör bir şekilde Arap harfleriyle basılmıştır. Ancak şu ana kadar Kürt-Latin alfabesi ile yazılmamıştır. Ovanıslı Molla Enver ve eserleri bugüne kadar Kürt edebiyatında tanınmamıştır. Bu çalışmada Ovanıslı Molla Enver'in kısaca hayatı anlatılmış olup şiirleri transkripsiyon harfleriyle Latinize edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Molla Enver, Divançe, Karçikanî, Latinize, Klasik Edebiyat

ABSTRACT

Mela Enver Esen from Ovanis, from Reşadiye (Karçikan) region was born in 1951 in Kurukaya (Ovanis) village of Tatvana in Bitlis. He has spent years in the villages of Van and Adana and has been educated in madrassas. Mela Enwer also wrote a collection of poems in the classical style.

This study focuses on the Latinization of the Court of the Mela Anwar Ovanisî of Karçikan. The Diwan of Mela Enwer has already been published amateurishly in Arabic type. But so far it has not been written in Kurdish-Latin script. Until now, Mela Enwer Ovanisi of Karçikan and his products have not been known in Kurdish literature. In this work, the life of Mela Enwer was briefly given and his poem was transliterated in Latin letters. In this work, the life of Mela Enwer Ovanisi is briefly given and his poem is Latinized with transcription letters.

Keywords: Molla Enwer, Divançe, Karçikanî, Latinized, Classical Literature

NAVEROK

PÊŞGOTIN	III
KURTE	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
NAVEROK	VII
DESTPÊK	1
I. METODOLOJÎ	1
1.1. Mijar, Girîngî û Armanca Projeyê.....	1
1.2. Çarçove û Rêbaza Projeyê.....	2
1.3. Çavkanîyên Projeyê.....	3
BEŞA YEKEM	4
1. JIYAN, BERHEM Ê ALÎYÊ EDEBÎ YÊ MELA ENWERÊ OVANISÎ YÊ KARÇIKANÎ	4
1.1. Jîyana Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî (ç. 1951- ...).....	4
1.2. Nav û Mexlesa Wî	5
1.3. Berhemên Wî.....	6
1.3.1. Dîwana Karçikanî.....	7
1.3.2. Heyat'ul-Şebab	7
1.4. Alîyê Edebî yê Mela Enwerê Ovanisî.....	7
1.4.1. Feqîyê Teyran.....	8
1.4.2. Harisê Bedlîsî	8
BEŞA DUYEM	11
2. JI ALÎYÊ RÛXSARÎ Ê NAVEROKÎ VE “DÎWANA KARÇIKANÎ” 11	11
2.1. Zimanê “Dîwana Karçikanî”	11
2.2. Ji Alîyê Rûxsarî ve “Dîwana Karçikanî”	11
2.3. Ji Alîyê Naverokê ve “Dîwana Karçikanî”	14
2.4. Hin Hunerên Edebî Yên di “Dîwana Karçikanî” de.....	16
2.4.1. Teşbîh.....	16
2.4.2. Telmîh	16
2.4.3. Tezad.....	16
2.4.4. Teraduf	17

2.4.5. Hesabê Ebcedê	17
BEŞA SÊYEM	19
3. TRANSKIRÎBEKIRINA METNA DÎWANÇEYÊ	19
3.1. Alfabeya Transkrîpsiyonê.....	19
3.2. Metna Dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî.....	20
1. (Destpêk)	20
2. (Heqê Gunehan da).....	21
3. (Heqê Quran da)	22
4. (Li Ser Muhemmed Ehemmed).....	25
5. (Heqê Dinyayê da).....	26
6. (Li Ser Halê Xwe)	28
7. (Heqê Seyda'ê Xwe da).....	29
8. (Teleba Şefa'eta Resûlullah)	30
9. (Fîgana Bal Fexrê 'Alem ve).....	33
10. (Li Ser Halê Gurbetê)	35
11. (Heqê Nûra Xuda da).....	36
12. (Li Ser Halê Miletê Bêkes)	37
13. (Li Ser Qelbê Zelal Hevalê Taze).....	40
14. (Heqê Miletê Mezlûm da).....	41
15. (Heqê Mezlûman da)	44
16. (Heqê Xortê Zeman da)	46
ENCAM	49
ÇAVKANÎ	51
PÊVEK	53

DESTPÊK

Edebîyata Kurdî edebîyateke kevn e, lê hêj baş nehatiye nasîn û kelûpelên wê hêj bi temamî derneketine holê. Roj bi roj berhemên nû derdikevin holê û xebat li ser wan têne kirin. Ji ber nebûna hêzeke sîyasî edebîyata Kurdî jî veşartî maye û baş nehatiye zanîn. Ev berhema ku bûye mijara vê xebata me yek ji wan berhemên ku heta niha nehatiye nasîn. Em dê di vê xebata xwe de metna Dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî latînzê bikin û derheqê nivîskarê wê de agahîyan pêşkêş bikin.

Weke tê zanîn ku li Tirkîyeyê heta sala 1928an alfabeya ku dihat bikaranîn alfabeya Erebi bû. Lêbelê piştî vê tarîxê şoreşa alfabeyê pêk hat û li Tirkîyeyê êdî nivîsîna bi tîpên Erebi hat qedexekirin û li dewsa wan alfabeya latîni hate qebûlkirin. Ji ber vê qedexeyê di nav Kurdan de jî bi hezaran mela, şêx û ehlê medreseyê jî ketin rewşeke xerab. Lewra berhemên vê derdorê jî bi herfên Erebi bûn. Di medreseyên Kurdan de û di edebîyata Kurdî de ev çanda nivîsîna bi tîpên Erebi hêj jî berdewam e. Ji ber ku bi hezaran berhemên Kurdan bi vê alfabeya Erebi hatine nivîsîn pêwîstiya bi latînzêya wan jî derket holê. Bi rêya xebatên bi vî rengî dê kesên nikaribin bi alfabeya Erebi bixwînin dê bikaribin van berhemên ku hatine veguhestin ser alfabeya Latîni bixwînin û dê bi vê yekê hay ji edebîyat û tarîxa xwe jî çêbibin. Bi xebatên bi vî şêklî dê lêkolêr jî bikaribin bi hêsani ji van metnan îstîfade bikin.

I. METODOLOJÎ

Mijara vê projeyê latînzêya metna Dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî ye û bi kurtasî analîza wê ya edebî ye. Li jêrê em ê cihê bidin mijar, girîngî, armanc, çarçove, rêbaz û çavkanîyên projeya xwe.

I.1. Mijar, Girîngî û Armanca Projeyê

Dema em li atmosfera ku Kurd tê de dijîn mêze dikin, em dibînin ku her tim rastî tune kirin û wêranîyê hatine. Gelek caran bi destên hêzên sîyasî malzemeyên tarîxî û edebî hatine tune kirin, ji ber vê yekê gelek berhemên Kurdî heta niha nehatine peyda kirin.

Mijara vê projeya me dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî ye Mela Enwer bi salên dirêj li herêma Wanê melatî kiriye û di salên 80ê de koçî Edeneyê

kiriye. Dîwançeya Mela Enwer heta niha nebûye mijara ti xebateke akademîk, ji ber vê yekê ev xebata ku em li ser dikin ji bo nasîna wî û berhema wî girîng e.

Armanca sereke ya vê xebatê ev e ku kitêbeke Kurdî ku heta niha zêde nehatiye bihîstin û xebatên akademîk li ser nehatiye kirin ji aliyê xwêneran ve were nasîn û bi vê projeyê li xebatên edebîyata Kurdî bê zêdekirin.

I.2. Çarçove û Rêbaza Projeyê

Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî dîwançeyeye Kurdî nivîsiye. Di vê xebatê de jî jîyana wî û helbestên wî yên Kurdî bûn mijara lêkolîna me, çarçoveya projeya me, jîyan û dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî ye.

Xebata me ji destpêk, sê beş û ji encamekê ve pêk hatiye. Em di beşa destpêkê de li ser metodolojîyê rawestiyan û me girîngî û armanca xebatê, rêbaza projeyê û çavkanîyên projeyê destnîşan kirin.

Di beşa yekem de em li ser jîyana Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî rawestiyan. Herweha di vê beşê de em li ser berhem, kesayet û aliyê wî yê edebî û edîbên ku li ser wî tesîr kirine sekinîn.

Di beşa duyem de me dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî vekola û em bi kurtasî li ser ziman, hunerên edebî rawestiyan. Me helbestên wî ji aliyê şekl û naverokê ve vekolandin.

Di beşa sêyem de jî em li ser metna dîwançeyê sekinîn. Me metna dîwançeyê latîniye kir û li gorî tîpên transkripsiyonê nivîsî. Ji ber ku metna destxet ne li ber destê me bû me metna xwe li gorî metna matbû ya li ber destê xwe nivîsî. Me di vê xebatê de bi alfabeya transkripsiyonê hemû helbest ji tîpên Erebî veguhest ser alfabeya Latînî.

Di metna alfabeya Erebî de gelek qusûrên îmlayê û hin jî yên teknîkî hebûn. Heta ji dest hat me ev kêmasî di metna Latînî de sererast kirin. Lêbelê hin bikaranînên şair jî li gorî devoka herêma wî bûn û me ev bikaranîn weke tercîha şair qebûl kir û me ew weke xwe hiştin.

I.3. Çavkanîyên Projeyê

Me ji bo vê xebatê ji çendîn çavkanîyan sûd wergirt, ji bo vê xebatê çavkanîyên herî girîng Mela Enwer û dîwançeya wî bû. Ji bo jîyana helbestvan em bi wî re ketin îrtibatê û wî ji me re behsa hûrgilîyên jîyana xwe, perwerdeya xwe û melatîya xwe kir û me jî ew agahî nivîsîn. Dîwançeya wî jî ji bo vê xebata me bingeh bû û me xebata xwe li ser vê dîwançeyê ava kir.

Li ser Mela Enwer û berhema wî ti çavkanî tunebûn an jî em rastî lêkolîn û xebatên akademîk nehatin. Lê ji bo beşên projeyê me ji çendîn pirtûkan sûd wergirtin: *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de* û *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* ên Abdurahman Adak di vê mijarê de ji bo me bûn pirtûkên bingehîn.

Ji bo beşa analîzê jî *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü* ya İskender Pala ji bo hunerên edebî jî ji pirtûka *Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat* a Yekta Saraç, *Açıklamalı Edebi Sanatlar* a İsa Kocakaplan û gelek xebatên ku di vê mijarê de hatin bikaranîn. Herweha me ji ferhenga *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat* a Ferit Develioğlu û ferheng û ji çavkanîyên din jî sûd wergirtin.

BEŞA YEKEM

1. JIYAN, BERHEM Û ALÎYÊ EDEBÎ YÊ MELA ENWERÊ OVANISÎ YÊ KARÇIKANÎ

1.1. Jîyana Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî (ç. 1951- ...)

Navê wî yê fermî Enver Esen e. Mela Enwer ji Ovanisa¹ Tetwana Bedlîsê ye û di sala 1951ê de li vî gundî hatiye dinyayê. Mela Enwer kurê Hecî Elî ye, Hecî Elî jî kurê Hecî Ilyas e.

Şecereya Malbata Mela Enwerê Ovanisî weha ye; Eva ha neseba me ye. Mela Enwer, kurê Hacî ‘Ezîz e, Hacî Ilyas, Hacî Ehmed, Mela Dewrişê Qadî, Mela Ebdullah, Mela Muhammed, Evdil, Mela ‘Elî, Mela ‘Ebdullahê Xerxûrî, Mela ‘Ebdirehman, Mela Derwêş, Mela Zade Qadî, Mela Ehmedê Qadî, Mela Huseyn, Mela Şiblîyê Meşhûr, Hacî Ehmed, Şêx Muhemmed, Şêx Yûsif, Şêx Muhemmedê Mekî, Sileyman Kurê Xalid kurê Welid.²

Mela Enwer bi qasî 12 salan feqîtî kiriye. Pêşî li ba diya xwe dest bi xwendinê kiriye. Mela Enwer Quran, Nûbihara Biçûkan û Mewlûda Kurmancî li gundê xwe li Ovanisê li ba pismamê bavê xwe li ba Mela Huseyînê kurê Hecî Caferê Ovanisî³ xwendiyê. Piştî xwendina Mewlûdê, Mela Enwer çûye gundê Şêvana Kawaşa⁴ Wanê û li ba Mela Hesênê⁵ kurê Hecî Caferê Ovanisî dest bi kitêbê rêzê yên medreseyê kiriye. Mela Enwer li ba Mela Hesên heta bi kitêba Sadullahê Gewre xwendina xwe kiriye û paşê çûye gundê Siyanisa Ziyaretê ya Xana Hawêla Sêrtê û li wir bi qasî şeş mehan li wir maye û ev kitêba Sadullahê Gewre bi tevahî li ba Mela Sa‘dullah Seven⁶ qedandiyê.

¹ Navê gundê Ovanisê niha bi Tirkî “Kurukaya” ye.

² Ji bo şecereyê bnr: Pêvek 3.

³ Hûseyîn Canbay jî ji gundê Ovanisa Tetwanê ye.

⁴ Kawaş: Gevaş (Westan).

⁵ Mela Hesên û Mela Huseyîn bira ne û pismamê bavê Mela Enwer in. Mela Huseyîn Canbay jî li ber destê birayê xwe Mela Hesên xwendina xwe kiriye. Mela Hesên birayê mezin e. Du wesfên Mela Hesên hene, jê re hem Mela Hesênê Karçikanî û hem jî Mela Hesênê Kawaşî tê gotin. Mela Hesên li Kaçkanîyê meşhûr e û li ba Mela Osmanê Xurûsî xwendiyê, lêbelê îcazeta xwe ji Mela Ebdulsametê kurê Mela Osman wergirtiye. (Çavkanî: Mela Enwer). Mela Hesên Karçikanî di sala 1997an de li wanê wefat kiriye.

⁶ Mela Sadullah jî pismamekî Mela Enwer bû û ev mela di tarîxa 02.02.2022an de li Diyarbekirê çû ber dilovaniya Xwedê. Ev mela bi eslê xwe ji Xerxo hatine û li Zoqeydê cîwar bûbûn.

Piştî qedandina vê kitêbê Mela Enwer dîsa vegeŕiyaye gundê xwe Ovanisê û dîsa bi qasî sê mehan li ba Mela Huseyînê Ovanisî xwendina xwe domandiye. Paşê ji wir jî di sala 1964an de çûye Kawaşê ba Mela Hesenê Karçikanî⁷ xwendina xwe sê salan dewam kiriye heta sala 1966an û heta kitêba Qewlê Ehmedê li ba Mela Hesen xwendiyê. Mela Enwer kitêba xwe ya dawî jî li ba Mela Hesenê Karçikanî xwendiyê, lêbelê îcazeta xwe nestandiyê. Mela Enwer ji terîqeta Neqşebendîyê û Xalîdî ye.⁸

Mela Enwer paşê berîya çûyîna leşkerîyê⁹ di sala 1968an de di 17 salîya xwe de jî bi qîza seydayê xwe re zewicîye. Mela Enwer xwedî 2 kur û 5 qîzan e.

Mela Enwer di 1971an de ji bo leşkerîyê çû Narlidereya Îzmîrê û ecemîtî jî li Afyonê kiriye û di 1973yan de jî teskereya xwe standiyê.

Mela Enwer bi qasî 15 salan melatî kiriye û piranîya melatîya xwe li Wanê li gundên Payîzavayê (Gurpınar) kiriye. Li gundê Zêrnakê (Hamurkesen) li mezraya Govanê melatî kiriye. Paşê çûye Şîdana Payîzavayê û li nav axayên Ertoşîyan li gundê Sokanê (Çatakdi) jî pênc salan melatî kiriye. Paşê li gundê Arixanê (Bozyiğit) ji pênc salan melatî kiriye. Paşê ji ber nexweşîyeke xwe ev herêm terikandiyê û ji sala 1985an û vir ve li bajarê Edeneyê cîwar bûye. Li Edeneyê jî bi qasî 15 salan melatîya fexrî kiriye û herweha li Edeneyê medrese vekiriyê û ders daye feqîyan.

Mela Enwer ji bilî tehsîla talebeyan bi nivîsînê re jî mijûl bûye, lê ji ber nexweşîya xwe gelek caran emelîyat bûye û navber daye nivîsînê.¹⁰

1.2. Nav û Mexlesa Wî

Navê wî yê rastîn Enver Esen e, lê wî xwe di dîwançeya xwe de weke Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî daye naskirin. Ovanis navê gundê wî ye û Karçikan jî navê herêma ku gundê wî lê ye.

Mela Enwer jî di dîwançeya xwe de mexlesa xwe bi kar anîye. Mexles bi piranî navê helbestvan ên xwerû û rasteqîn bixwe ye.¹¹ Mela Enwer navê xwe yê sade weke mexles tercih kiriye û di nav helbestên xwe de 29 caran mexlesa xwe bi kar anîye. Di

⁷ Karçikan ji mintiqeyê herêma Tetwanê re tê gotin, herweha weke herêma Reşadiye jî tê zanîn.

⁸ Ji hevpeyvîna me ya di 09.01.2022.

¹⁰ Ji hevpeyvîna me ya di 09.01.2022.

¹¹ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; Abdurrahman Adak, "Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de", **Nûbihar Akademî**, hejmar 10, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2018, r.38.

helbestên 5-10-12-15-16an de mexles tune ye. Mela Enwer di helbesta xwe ya 9an de 7 caran mexlesa xwe bi kar anîye.

Enwer were bes e razê de hişyar be li te gazî
Heval çûne hêj tu razê tevî mulk emlak dixazî

Enwer ‘umur te xilaş kir heçî çûyî te zerar kir
Ji bo dunya li ber her kes heta kengî bibî razî

Birayê dîn û dîndar be digel te her zeman yar be
Wê ji halê te xeberdar be bi hummet ew xeberdar e

Enwer bes e tu feryad ke wê hewara te bêt bira
Mela Edhemê Berwarî bi qelem qelbê te kew da

Enwer ya Reb Xuda’ê min tamam dost û hevalê min
Ewan ‘uşaqê mîna min xilaş bike di heşrê da

Enwer halê te tunîne çiqas qelbê te birîne
Hisaba qebrê xeyr nîne ka zivre car kî tewbe ke
(13/5-6-7-8-9-10)

Mela Enwer di helbesteke xwe de jî mexlesa xwe ango navê xwe bi herfên
Erebî daye nîşandan û bi vî awayê mexlesa xwe bi cih kiriye. weke;

Li al û ezwacu eşhab li ser yar fexrê ‘alem bit
Dibêjit **elîf nûn waw** eger **ra**’ek li pey danî
(6/14)

1.3. Berhemên Wî

Heta niha du berhemên Mela Enwer hatine nivîsîn. Dîwançeya wî ya bi navê
Dîwana Karçikanî tamam bûye û kitêba wî ya bi navê *Heyat’ul-Şebab* (Jîyana
Ciwanan) jî hêj neqediyaye û nivîsîna wê didome.

1.3.1. Dîwana Karçikanî

Mela Enwer ev Dîwançeya xwe bi Kurdîya Kurmancî û bi terza helbesta klasîk nivîsîye û jê re gotiye “Dîwana Karçikanî”. Lêbelê her çiqas wî weke dîwan bi nav kiribe jî ev berhem ji alîyê hecma xwe ve dîwançeyeke û ne muretteb e. Dîwançe ji 16 helbestên Kurdîya Kurmancî pêk hatiye û tê de 388 malik hene. Mela Enwer di 1988an de dest bi vê Dîwançeya xwe ya kiriye û di 6-7 salan de ew temam kiriye. Ev dîwançe carekê di sala 1921ê de bi awayekî amatorî bi herfên Erebî weke metbû hatiye çapkirin. Teshîha wê ji alîyê ‘Ebdulhadî kurê Mela Se‘îd Ovanisî ve hatiye kirin. Ev kitêba çapkirî bê weşanxane û bê kunye ye.

Di dîwançeyê de şair bêtir li ser gunehên xwe li ser eşqa ji bo Hz. Muhammed sekinîye. Herweha şair di vê berhema xwe de li ser şexsîyetên heyama komara Tirkîyeyê yên weke Şêxê Palo, Bedîuzzeman Se‘îdê Kurdî jî sekinîye. Mela Enwer bêtir li ser halê xwe, derûnîya xwe û li ser guneh û efûkirina gunehên xwe nivîsîye. Mela Enwer li ser seydayên xwe û halê wan jî sekiniye. Li ser rewş û perîşaniya Kurdan gelek helbest nivîsîne û zilm û neheqîya li dijî Kurdan bi rêya helbestan anîye ziman.

1.3.2. Heyat’ul-Şebab

Hetat’ul-Şebab (Jîyana Ciwanan / Gençlik Hayatı), ev kitêb bi Erebî ye û hêj neqedîyaye. Li gorî ku Mela Enwer gotiye dê ev kitêb bi Kurdî û Tirkî jî bê amadekirin. Ev kitêb li ser ciwanan e, mijara wê ew e ku ciwan dê çawa xwe ji xerabî û kufrê dûr bixin û dê jîyana xwe çawa bi başî bidomînin.¹²

1.4. Alîyê Edebî yê Mela Enwerê Ovanisî

Mela Enwerê Ovanisî jî weke edîbên ku di medresan de perwerde bûne wî jî di bin tesîra çanda medreseyê de berhemeke edebî anîye wucudê. Mela Enwer bi terza helbesta klasîk helbestên xwe hûnandine. Dema em helbestên wî mêze dikin rewşa wî ya rûhanî xwe bi awayekî aşkere dide der. Mela Enwer di helbestên xwe de tevî fikrên xwe yên şexsî nezîre jî li ser helbestên helbestvanên pêşîya xwe nivîsîye. Ev jî tê vê

¹² Ji hevpeyvîna me ya di 09.01.2022yan de.

maneyê ku Mela Enwer ji çand û mahsûlên edebîyata Kurdî ya klasîk haydar e û xwendiyê û di bin tesîra wan de berhema xwe nivîsîye. Di helbestên wî de em tesîra Feqîyê Teyran û Harisê Bedlîsî dibînin. Em ê li jêr behsa van her du kesên navborî bikin.

1.4.1. Feqîyê Teyran

Feqîyê Teyran helbestvanekî Kurd ê kevnar e. Di sala 1941ê de de hatiye dinyayê. Navê wî yê rastî Muhemmed e. “Feqî” mexlesa wî ya helbestê ye. Di nav gel de bêtir weke “Feqî” hatiye nasîn. Feqîyê Teyran helbestên xwe bi Kurdî hûnandiye û heta roja me gelek kes di bin bandora wî de mane.¹³ Helbestvanê me Mela Enwer jî Feqî xwendiyê û di bin tesîra wî de maye.

Feqîyê Teyran

Dilo rabe dilo rabe
Veke çavan ku êvar e
Nezan û bes di xew da be
Bi newmê ra mebe yare¹⁴

Mele Enwerê Ovanisî

Dilo rabe dilo rabe bike tewbe ku hêja zû
Veke çava ji xewa kûr ji ber gunhan tewbe ke zû

(2/1)

1.4.2. Harisê Bedlîsî

Harisê Bedlîsî helbestvanekî sedsala 18em û ji Bedlîsî ye. Harisê Bedlîsî bi Kurdî *Leyla û Mecnûn û Yûsif û Zelîxa* nivîsîye û ji bilî van berheman helbestên wî yê serbixwe jî hene. Di berhema xwe de “Sewadî” weke mexles bi kar anîye.¹⁵

¹³ Ji bo agahîyên berfireh binêr: M. Xalid Sadînî, *Feqîyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî)*, Weşanxaneya Nûbihar Çap 8, Stenbol 2014, r.11-54.

¹⁴ Sadînî, 2014, r. 203.

¹⁵ Abdurrahman Adak, *Destêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanxaneya Nubiharê, Stenbol 2015, r. 288-292.

Mela Enwer li ser helbesteke Harisê Bedlîsî nazîreyek nivîsîye. Nezîre di edebîyatê de li ser helbesteke kesekî din bi heman şewaz, qafîye û kêşeyê nivîsîna helbesteke nû ye.¹⁶ Di çanda edebîyata klasîk de ev yek gelek caran hatiye kirin, gelek helbestvan li ser helbestên helbestvanên berî xwe û yê serdema xwe nezîre nivîsîne. Mela Enwer jî ev kevneşopî berdewam kiriye û li ser helbesta Harisê Bedlîsî nezîre nivîsîye. Li gor ku Mela Enwer li ser vê helbestê nazîre nivîsîye wî ev helbest ecibandiye û li ser helbesta xwe zêde kiriye. Herçiqas helbesta Sewadî helbesteke evînî be jî lê Mela Enwer di nezîreya xwe de fikrên xwe yên neteweperwerî anîye ziman. Helbest li ser mezlûmbûna gelê Kurd hatiye hûnandin.

Ey felek dîsa te kul kir derd û êşanê di min
Mişlê bulbul meylê gul kir zad û efgan di min

Şerbeta lefz û kelaman, wê di nêv tasa û caman
Dane cumle xass û ‘aman, cam û fincanê di min

...

Helqe û zulfên di yarê şubhê şemsa ber gulavê
Kir tejî ba’ê biharê ceyb û dama’ê di min¹⁷

Çend kelamek gotinê min bi delal û nazenîn
Zarê Kurmanc ku bixûnin beyt û dîwanê di min

Da bizanin em jî Kurd in ji diyarê em vemiştin
Ji bo zaran gelek xişt in ‘ar e namûs e li min

Çi li me hat gelî Kurdan hev dikuji ji bo peran
Mane esîr serê çîyan mîr û xandarê di min

Da werin Kurmancê guhdar neken zulm û zîletê
Neken buhtan hev nekuji kanê dîn û çîrayê min

¹⁶ İskender Pala, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 354.

¹⁷ Ji bo agahîyên derbarê helbesta Sewadî de binêrin. Perwîz Cîhanî, **Leyla û Mecnûna Sewadî**, Weşanxaneya Sîtav, Wan 2021, r. 69-74.

Di dunya da hema her kes kirin destek bûne dewlet

Dîn û emlak 'ilm û 'irfan nema yekser miletê min

(12/ 10-15)

Ev helbesta Mela Enwer bi tevahî 37 malikan pêk hatiye. 10 Malikên ewil ne biawayekî bi rêk û pêk be jî ji helbesta Sewadî hatiye girtin. Ji malika 11an pê ve helbesta Mela Enwer dest pê dike.

BEŞA DUYEM

2. JI ALÎYÊ RÛXSARÎ Û NAVEROKÎ VE “DÎWANA KARÇIKANÎ”

2.1. Zimanê “Dîwana Karçikanî”

Mela Enwer dîwançeya xwe bi Kurdîya Kurmancî nivîsîye, lê di nav helbestên wî de em rastî bêjeyên ji zimanê weke; Erebî, Farisî û Tirkî jî tên. Li gor agahiyên ber destê me Mela Enwer bi Erebî û Tirkî dizane heta niha berhemeke bi Erebî jî dinivîse. Hin bêje û terkîbên biyanî ku di dîwançeyê de cih digirin ev in:

Kanê ‘Usman(ê) **zîn-nûreyn** ku şehîd bû li ser Quran
Dema hatî dikir qedûm kanê Muḥemmed Eḥmeda

(4/3)

Le ‘în mel ‘ûn tu jê dûr ke ku mîr bitin li wê rûne
Ku ḥakim li her du cihan bê guman ket rehmê li te

(13/13)

Bike **yardim** necm û millet necmê dîn ra bit penah
Da bibit xweşyû serbestî şahê ‘**alem el-meded**

(9/28)

Ew qanûna ku ew çêdken dibêjne xelqê qebûl ken
Ewî navê li xwe dîken dibên **çağdişî** ye Quran

(3/14)

Bi xetmê Xatema Ḥesen ku bêtin Seydayê min zû
Di sekerata **mergê** da şehadet ke devê min zû

(2/21)

2.2. Ji Alîyê Rûxsarî ve “Dîwana Karçikanî”

Mela Enwerê Ovanisî ev berhema ku ji helbestan pêk tê weke “Dîwana Karçikanî” bi nav kiriye. Lê belê ev berhem ji alîyê teşe, qeware û herfên alfabeya Erebî ve ne mureteb e û her wiha biqasî dîwanekê jî ne bi hecm e. Di berhemê de bi

hemû teşe û cureyan ve helbest tê de tune ne. Lewra ev berhem ne mureteb e, nabe dîwaneke kamil û dibe dîwançeyek.

Di vê dîwançeya Mela Enwer de 16 helbestên bi terza Klasîk hatine nivîsîn cih digirin û ev helbest hemû bi kêşa erûzê hatine nivîsîn. Hemû helbestên wî bi malikan hatine nivîsîn û dîwançe bi tevahî ji 388 malikan pêk tê. Di dawîya wê de beşeke temetê ya bînav û listeyek (fihirîst) helbestan û herweha diayek bi Erebi jî heye. Mela Enwer hemû helbestên xwe bi nav kiriye û ev nav hem di fihirîstê de hene û ew di serê hemû helbestan de bi cih kirine.

Mela Enwer helbestên xwe bi teşeyên weke: Mesnewî, qesîde û xezelê nivîsîye. Mesnewî di nav teşeyên nezmê de ku ji beytan pêk tînin teşeyeke girîng û naskirî ye û wek cureyeke edebî jî qadeke berfireh a edebîyata klasîk a Îslamî ye.¹⁸ Mela Enwer çar helbestên xwe bi vê teşeyê nivîsîne.

Di qesîdeyê de, helbestvan berê xwe dide kesekî û bi meqsedekê helbesta xwe dibêje. Ev meqsed jî yan pesnê kesî ye, yan jî daşorîn, pîrozbahî, şîna wî kesî û tiştên bi vî rengî ne.¹⁹ Di dîwançeyê de neh helbest bi teşeya qesîdeyê hatine nivîsîn.

Xezel ew helbestên ku di nav teşeyeke taybet de li ser mijara evînê hatine nivîsîn îfade dike.²⁰ Xezelên ku mijara wan pîr û şêxên terîqetê ne wek xezala tekyayê dikarin bînavkirin. Xezala tekyayê jî jêcureyeke xezala tesewifî ye. Lêbelê di vê cureyê de li ser tesewifa teorîk û felsefî nayê rawestan.²¹ Di dîwançeya Mela Enwer de du helbestên wî bi teşeya xezelê hatiye hûnandin. Yek ji wan helbestan jî bi teşeya helbesta xezala tekyayê hatiye nivîsîn.

Helbesta yekem bi sernavê “Destpêk”ê hatiye binavkirin û piştî vî navî bi “Bismillahê” helbesta yekem hatiye destpêkirin. Ev helbesta bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn bi tevahî 17 malik e.

¹⁸ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ua Klasîk de*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019, r. 245.

¹⁹ Adak, 2019, r. 112.

²⁰ Adak, 2019, r. 166.

²¹ Adak 2019, r. 227.

Helbesta duyem bi serenavê “Heqê Gunehan da” hatiye binavkirin. Ev helbest jî bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 21 malikan pêk hatiye.

Helbesta sêyem bi serenavê “Heqê Quran da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û helbest bi tevahî ji 35 malikan pêk tê.

Helbesta çarem bi serenavê “Li Ser Muḥammed Eḥmed” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 20 malik e.

Helbesta pêncem bi serenavê “Heqê Dinyayê da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 17 malik e.

Helbesta şeşem bi serenavê “Li Ser Ḥalê Xwe” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 20 malik e.

Helbesta heftem bi serenavê “Heqê Seydayê Xwe da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 19 malik e.

Helbesta heştem bi serenavê “Teleba Şefa‘eta Resûlellah” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 30 malik e.

Helbesta nehem bi serenavê “Fîxana Bal Fexrê‘ Alemê ve” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 36 malik e.

Helbesta dehem bi serenavê “Li Ser Ḥalê Xurbetê” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 15 malik e. Ev helbest jî aliyê paşserwaya xwe ve ne bi rêk û pêk e, lewra heta malika pêncan paşserwaya helbestê “ez” e, lê ji malika şeşan pê ve paşserwa guherîye û bûye “da”.

Helbesta yazdehem bi serenavê “Heqê Nûra Xuda da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya xezala tekyayê hatiye nivîsîn û bi tevahî 18 malik e.

Helbesta duwazdehem bi serenavê “Li Ser Ḥalê Miletê Bêkes” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya xezelê hatiye nivîsîn û bi tevahî 37 malik e.


Helbesta sêzdehem bi serenavê “Li Ser Qelbê Zelal Hevalê Taze” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û 15 malik e.

Helbesta çardehem bi serenavê “Heqê Miletê Mezlûm da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û bi tevahî 42 malik e.

Helbesta pazdehem bi serenavê “Heqê Mezlûman da” hatiye binavkirin. Ev helbest bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn û ji 29 malikan pêk tê.

Helbesta şazdehem bi serenavê “Heqê Xortê Zeman da” hatiye binavkirin. Ji ber ku ji alîyê serwayê ve tê de hevgrtinek tune ye şeweya wê ne diyar û helbest bi tevahî 17 malik e.

Tablo 1: *Tabloya Rêjeya Teşeyên Nezmê yên ku di Dîwançeyaya Mela Enwer de Cih Digirin*



2.3. Ji Alîyê Naverokê ve “Dîwana Karçikanî”

Mela Enwer ji ber ku bi çanda medreseyê perwerde bûye, berhema xwe jî di bin tesîra vê çandê de daye. Dema em li helbestên wî mêze dikin tê de alîyê wî yê dînî û tesewîfî xwe bi awayekî aşkere derdixe pêş. Mela Enwer mirîdekî terîqeta Neqşebendîye ye û şêxê wî Şêx Me’sûq e. Di helbestên xwe de behsa şêxê xwe dike û ji bo wan medhan dike. Her wiha ji bilî vê mijarê behsa mijarên weke: tewhîd, na’et û daşorîna serdema komara Tirkîye, kuştina Kurdan û nebûna dewleta wan dike. Dema em li helbestên wî mêze dikin rexneyeke xurt ji bo serdema modern û tiştên ku bi xwe re anîye tê dîtin.

Dema em li helbesta yekem mêze dikim hem bi cureya munaceatê hatiye nivîsîn hem jî di mijara tewhîdê de ye. Peyva munacatê tê maneya ji Xwedê re dia kirin û weke têgeheke edebî jî munaceat tê maneya lavakirinê ji Xwedê re.²²Tewhîd jî tê maneya yekbûn, yekkirin, bihevvekirin, tekanînkirin. Wek têgeheke edebî jî tê maneya bawerî anîna bi yekbûna Xwedê, dubarekirina yekbûna Xwedê û ji bilî Xwedê qebûlnekirina Xwedayekî din jî dibe tewhîd .²³ Ji ber ku her du cure jî ji bo Xwedê têne nivîsandin helbestvan her du cureyan têkelî hev kiriye û helbesta xwe nivîsiye.

Dema em li helbestên duyem, şeşem û yazdehem mêze dikin helbestvan di van helbestan de gilî û gazine gunehen xwe dike. Ji bo ku ji xewa xewletê hişyar bibe bangî xwe dike. Efûya xwe ji Xwedê dixwaze.

Dema em li helbesta sêyem mêze dikin helbestvan li ser Quranê ev helbest nivîsiye. Di helbesta xwe de dibêje ku divê mirov bi hikmê Quranê werin birêvebirin û rexneyê li makeqanûnan dike û divê bila mirov bi şerîetê werin birêvebirin. Hin qanûnên din weke tiştêkî xirab dibîne.

Mela Enwer di helbestên xwe yê çarem, heştem û nehem de li ser medhê pêxember sekinîye û ev her sê helbest di cureya ne'tê de nivîsiye. Ne't, ew menzûme ne ku derheqê wesf, pesn û sîtayîşa Cenabê pêxember de têne nivîsîn.²⁴

Di helbestên xwe yê pêncem, duwazdehem, sêzdehem, çardehem û pazdehem de rexne li dinyayê, li nebûna dewleteke Kurdan, kuştina gelê Kurd, serdestîya ziman û dewletên din dike. Dibêje xwezî yek rojekê min bidîta em Kurd jî bûne xwedî dewlet. Helbestên ku di cureya rexneyê de têne nivîsîn di edebîyatê de weke “daşorîn” hatine binavkirin. Em dikarin bibêjin ku ev helbestên Mela Enwer jî dikevin nav cureya daşorînê.

²² Ahmet Mermer, Sebahat Deniz, Yavuz Bayram, Lütfi Alıcı, Muvaffak Eflatun, Neslihan Koç Keskin, **Üniversiteler için Eski Türk Edebiyatına Giriş**, Akçay Yayınları 11. Baskı, Ankara 2014, r. 272.

²³ Mermer, Deniz, Bayram, Alıcı, Eflatun, Koç Keskin, 2014, r. 276.

²⁴ Adak, 2019, r. 154.

2.4. Hin Hunerên Edebî Yên di “Dîwana Karçikanî” de

2.4.1. Teşbîh

Ji bo bêje bêtir bê xurtkirin, di navbera du tiştên ku têkilîya wan bi hev re hebe û ji aliyê şibinî ve yê qels bi ya hêzdar ve bê şibandin jê re teşbîh tê gotin.²⁵ Di dîwançeya Mela Enwer de em rastî hunera teşbîhê tên weke:

Min firqet dît di şerqê da yeka dîtir di beytê da
Wekî perwan di ‘îşqê da di ber bejna şemalê de
(10/10)

2.4.2. Telmîh

Ji bibîrxistina rûdanek, çîrokek, kesek, pêkenokek, gotineke pêşîyan, mîzahek, metelokek, bawerîyek dînî ku navdar be û ji aliyê gelek kesan ve were zanîn re telmîh tê gotin.²⁶

Kanê enşar kan muhacir kanê Hesen xudanê tac
Kanê Huseyn ku bû şehîd kanê Muḥemmed Eḫmeda
(4/5)

2.4.3. Tezad

Du têgehên dijber ku aliyên wan yê hevpar hene, di maneya rast û mecaz de were bikaranîn hunera tezadê derdikeve holê. Tezad hunereke heyecanîyê ye. Ev bibîrxistin bi awayekî dijber tiştêkî din bibîr dixê.²⁷

Dînsiz rabûn **dîndar** xuyan temelê dîn qed nehêlan
Mu‘min ketne li ser rîyan kanê Muḥemmed Eḫmeda
(4/11)

²⁵ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Prof. Dr. M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkuşbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014, n.r.129.

²⁶ Saraç, 2014, r.282.

²⁷ İsa Kocakaplan, **Açıklamalı Edebî Sanatlar**, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, 9. Baskı, İstanbul 2017, r. 187.

2.4.4. Teraduf

Teraduf tê wê me'neyê ku kesek di gotina xwe da du yan çend bêjeyên ku me'neya wan yek be bi kar bîne. Ev huner cuwanî û tesîreke taybet dide gotin û nivîsînê.²⁸

Di weqtê **mirin û mewtê** bide **Enwer** tu quwwet

Bikêşim ez ji dil û can bi tewhîd û şehadet

(1/12)

2.4.5. Hesabê Ebcedê

Helbesta ku bi herfên Erebî hatibe nivîsîn û di wê de dayîna tarîxa bûyerê bi hesabê ebcedê hebe, ji wê re danîna tarîxê tê gotin.

Di elîfbêya Erebî de ji 1'ê heta 1000'î cuda cuda hejmar li tîpan hatine danîn û ji vê yekê re jî "**hesabê ebcedê**" û "**hesabê cifrê**" tê gotin. Cedwela hesabê ebcedê wisa ye:

1 = أ	8 = ح	60 = س	400 = ت
2 = ب	9 = ط	70 = ع	500 = ث
3 = ج	10 = ي	80 = ف	600 = خ
4 = د	20 = ك	90 = ص	700 = ذ
5 = هـ	30 = ل	100 = ق	800 = ض
6 = و	40 = م	200 = ر	900 = ظ
7 = ز	50 = ن	300 = ش	1000 = غ ²⁹

Kitabet nezmê tamam kir li ser gunhan barek danî

Kû 'eyn bêtin ji **elîf** da gava cebel diçe hezfi

²⁸ Perwîz Cihanî, **Mem û Zîn Ehmedê Xanî bi Lêkolîn û Şîroveyeke Nû**, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 48.

²⁹ M. Zana Karak, "**Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**", (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2020, r. 125.

Kû 'efû hat ji ber **hê waw** hezar 'eyn **bê** têxit cezbê
Ku cezba şofiyên têtin ji ber zikrê huwel-baqî

(6/15-16)

Di van malikan de helbestvan tarîxa nivîsîna helbestên xwe bi hesabê ebcedê
daye.

BEŞA SÊYEM

3. TRANSKIRÎBEKIRINA METNA DÎWANÇEYÊ

3.1. Alfabeya Transkrîpsîyonê

Dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî jî bi tîpên Erebî hatiye nivîsîn. Hin tîpên weke **p** (پ), **ç** (چ), **j** (ج) û **v** (ف) ku di berhema Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî de hene di alfabeya Erebî de tune ne. Me di latînîze û transkrîpsîyonê de alfabeya navneteweyî bi kar anî û metna dîwançeyê li gorî wê nivîsî.

Alfabeya ku me di latînîzekirina metnê de bi kar anî ev e:

Herfên Transkrîpsîyon yên Navneteweyî			
Erebî	Kurdî Latînî	Erebî	Kurdî Latînî
ا	a	ط	ţ
ب	b	ظ	z
پ	p	ع	'
ت	t	غ	ğ
ث	ṯ	ف	f
ج	c	ق	v
چ	ç	ك	k
ح	h	گ	g
خ	x	ل	l
د	d	م	m
ذ	z	ن	n
ر	r	ه	h
ژ	j	و	û-u-w
س	s	ی	y-î-ê
ش	ş	ء	'
ص	ş	Apostrof	'
ض	z/d		

3.2. Metna Dîwançeya Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî

1. (Destpêk)

Bîsmîllahirrehmanirreḥîm

1. Ellahû waḥîd ehed ‘alem ḥemî te çêkir
Tu bê mişl û zehîr û ‘erş û kursî te çêkir
2. Mirin û rabîn³⁰ dê hebit mîna cennet cehennem
Ḥeşr û neşr û wek mîzan ‘emel wê bêne kêşan
3. Tu şanî‘ê mexlûqê medḥ û şena ji bo te
Meḥammed ḥebîbê te ye şelat selam li ser be
4. Digel al û eşḥaban digel ê ku bin tabî‘
Digel ê ku bîzanin Ḥeqq û ‘edalet tabî‘
5. Ḥeçî ‘emelê wan baş e bi luḥfa te Ilahî
Dibe şafi‘ Meḥammed dabûr dibin wî alî
6. Ew ê ‘emel neqenc be ḥalê wan pur xirab e
Zebanî dîkin gazî îro we ḥal xirab e
7. Herçî îman tamam be reḥmet imdada wan tê
Zunûbê³¹ me pur zeḥf in ḥalê me dê çewan be
8. Nefs û Şeyṭan her dû yek hev ra dîkin xirabî
Quwwet nemaye ey **Enwer** imdada te Xuda bî
9. Tu Reḥman û hem Reḥîm tu şahîb yewmu’l-dîn
Tu malîkê kai’natê tu yî Rebbil-‘alemîn
10. Ez im xweyê barê giran tevda zunûb quşûr in
Tu Qehharî tu Ğeffarî tu Qadîrê her şey’î
11. Curm û zenebê te ey **Enwer** bê sîtare bê ḥicab
Gazî bike tu Neqşîyan umîd Rebbil-‘alemîn
12. Di weqtê mirin û mewtê bide **Enwer** tu quwwet
Bîkêşim ez ji dil û can bi tewḥîd û şehadet
13. Bi navê Xudayê mezin min bi dilê xwe yê jarîk
Bi ḥalê guneḥê xwe we ḥalê dewra zamanê nepak

³⁰ Rabûn.

³¹ Guneḥ.

14. Min rica kir ji Xudayê mezin we pêgemberê rehberê pak
Min xwe parast ji dunyayê we hinek nebaşê nepak
15. Min destê xwe avête zincîra hinek zatê pak
Da ku xwendekar û heval û guhdar neçin alîyê nepak
16. Da ku bixûnin van gotinan bi zimanê Kurdî yê xweşik
Min navê wê danî “Dîwana Karçikani” yê jarik
17. Min hêvî heye ji wan kesê carek bibêjî du ‘ayê pak
Neket kêmasiyyê dilreşî be bextiyariyê xweşik

2. (Heqê Gunehan da)

1. Dilo rabe dilo rabe bike tewbe ku hêja zû
Veke çava ji xewa kûr ji ber gunhan tewbe ke zû
2. Tu xew da bû guneh rabûn ji hed zêde hêja ne zû
Wê halê te dê çewan bit bike tewbe hêja bi zû
3. Em ‘ibad³² in dîkin guneh belê wacîbe tewbe zû
Ji tewbê ra sê şerî hene ku temîz bin hêja bi zû
4. Eda bikey tamam heqan çî ku ser te hebit bi zû
Heqê Xuda nabit winda tamam ferzan eda ke zû
5. Eger heqqê xelqê hebit ewan razî ke hêja zû
Bike ‘ehdê bide peyman nebêje tu zeman hêj zû
6. **Enwer** zivre were ser rê bû ye êvar hêja ne zû
Gelek firşet li te bûrîn ‘umr çûye hêja ne zû
7. ‘Umur li min çilan çûye taqet ketim hêja ne zû
Li wê riyâ ku musteqîm li cehdê ke hêja ne zû
8. Ew cehda ‘alim murşidan li ser heqqê bizan hêj zû
Li wê riyê tu hişyar be neke inkar qebûl ke zû
9. Gelek xwendekar vê dewrê diçin fisqê belê bi zû
Dîbin rehber ji bo cehlan dîkin inkar her şey’ê zû
10. Qebûl naken tu mezheban dîbin munkir li her kes zû

³² ‘Ebd .

Riya Resûl naken qebûl dibêjin Qur'an bîne zû

11. Wiha xelqê dixapînin ji bo nam-şuhreta xwe zû
Bi tekzîbê diken fexrê hedîs inkar diken ew zû
12. Dibin hevalê zindîqan neden pey wan hişyar be zû
Eya wa'izlem yete'zî meke buhtan tewbe ke zû
13. Ka hişyar be nefsa murdar meke kibrê heman tu zû
Min tewbe şed hezar caran qebûl ke ya Rebbî tu zû
14. Heyatê da min tewbe ye dibim poşman ku hêja zû
Dikem fiğan pur ey ustaz were imdad ku hêja zû
15. Eşl û neseb em ji te ne bi me ferdek ji we ta zû
Ilahî ismê e'zem key Me'şûqê Neqşî bêt hêja zû
16. Bêt imdada min ê exter dest im bigerin hêja hêj zû
Bi eşşeh tewbe kî neşûx li **Enwer** ke neşîb hêja zû
17. Bi tewbe min bibin qebrê bidem cewab ku hêja zû
Munker Nekîr dema purs ken cewab bidem hêja bi zû
18. Bidem cewaba Rebbê xwe rûhim raşet bî hêja zû
Bi hummet quţbê Rebbanî şahim were ku hêja zû
19. Bi Geylan Gewşê Hîzanê³³ ricakarim dikem arzû
Bi Tağî Seydayê Norşîn here li pey wan ku hêja zû
20. Bi Eşmed Şêxê pur me'şûq bi zincîr bigir hêja zû
Ziya'uddîn û Şêxê Kal dikem feryad û zarî zû
21. Bi xetmê Xatema Hesen ku bêtin Seydayê min zû
Di sekerata mergê da şehadet ke devê min zû

3. (Heqê Quran da)

1. Gelî xaşan gelî 'aman werin guhden dengê Quran
Bi tefekur biken iz'an niyet ixlaş bixûn Quran

³³ Şêx Ebdilqadirê Geylanî, di navbera salên 1077- 1166 jîyaye. Navê wî yê rastî Muhyîddîn Ebû Mihemed 'Ebdilqadir b. Ebî Salih e. Li gundê Nafyê hatiye dinyayê ku nêzikê Behra Hezarê ye. Terîqeta Qedirî navê xwe ji wî hildaye û di nav misilmanan de gelek bela bûye. (Yakup Aykaç, "Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)", (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Çewlîg 2015), r.283)

2. Bi dil û can biken iqrar qebûl neken ğeyrê Quran
Lazim rêçûname hemiyar eva qanûn rîya Quran
3. Kufr û nîfaqan vî weqtê li Islamê kirin derse
Gelî ‘alim xwendekarî biken cihad li rîya Quran
4. Bi Quranê biken ‘emel ji ğeyrê wê nekin bawer
Muheqqeq Muhemmed rehber e ku nabit îlla fî Quran
5. Em ê herne her ciyê amî bêjin bi her dîlê
Aşkera ken li cihanê çenabîtin bê Quranê
6. Biken qîrek li dunyayê Islam pê bête hêjayê
Îmdad bê Babê Faţmayê qebûl ken hukmê Quranê
7. Ew hakimê hukmê neket bi ‘edalet hukum neket
Zalim ji mezlûm red neket ew zalim e gorî Quran
8. Ev zindîqê hatine li text şer‘ê li me wînda kirin
Islam îro tev bûne ‘ebd dibên em in ehlê Quran
9. Dibêjin qanûn em çêdiken heqqê insan em nasken
Tesetturê em dê raken eva nivêj eva Quran
10. Ew hukmê Ata’ û Papa ku çêdikin şenem û pûtan
Dibin çağdaş ji bo xelqan eva qanûn ji ğeyrê Quran
11. Ew zindîqê çavhişîn e xûna Islam dimêjîne
De gêş kir tev şer‘û heqqan anayasa ye ne Quran
12. Dê **Enwer** tu rabe ser xwe qelem bigre bi destê xwe
Kufrê bavêje ber pê xwe bilind bike dengê Quran
13. Ew kufra rezîl û murdar ku Islam anîye vî hal
Neken carek li wan bawer ber hev bin hûn dora Quran
14. Ew qanûna ku ew çêdiken dibêjne xelqê qebûl ken
Ewî navê li xwe diken dibên çağdişî ye Quran
15. Ew xa‘în in li vî dînê dê ew bimrin bi vê jînê
Qîrek diken pûtûlatan eva hatî hukmê Quran
16. Çarşef û turbana li wan ker ker diken pûtan li wan
Bahadır gencê Islamê dibên em in ehlê Quran

17. Dibên Islam riya me ye Muḥemmed rehberê me ye
Bi dîl û can dibin tabî' diken cihada Quranê
18. **Enwer** gelek zêde negre ji hedê xwe zêde meke
Bike xidmeta vî dînî bigrin bi qulpê Quranê
19. Li wê riya Muḥemmedî tamam eşhab ku hicret kir
Mal û ewlad tamam hêlan ber hev bûn dora Quranê
20. Ew î Rebbê Kelamê heq ku hediye kir bo Muḥemmed
Tu yî reḥmet ji 'alem ra tu murselê bi Quranê
21. Bi wî Islam te tamam kir tamam dînan te beṭal kir
Încîl û Tewrat û Zebûr mensûxê bûn ew bi Quran
22. Kibir kirî 'Ezazîlê mel'ûn neçû secde nekir
Bû dujminek şedîd li me xeber da me vê Quranê
23. 'Ezazîl Adem dujmin dî Cennetê da ku wî xweş dî
Ku hîrşê nefsa wî reşkir qesem kir wî bi Quranê
24. Li Adem wî neşîhet kir bi Ismê E'zê qesem kir
Hûn ekil ken evî darê ebd mînin vê Quranê
25. Ji dar xarin girîn kirin hezar le'net mel'ûn kirin
Li wî evan hev terk kirin evaha gotina Quran
26. Emma Adem gelek zar kir serê xwe secde'ê rakir
Ji Reb 'efwa xwe rica' kir bi Eḥmed Xatemê Quran
27. Xuda da xatirê Eḥmed ji bo mexlûq Muḥemmed Serwer
Eyyûb Yûsif bi te xweş bûn ku hat zanîn bi Quranê
28. Ku çerxa eflakan dewr bûn li hev wer bûn gelek şa bûn
Ji sirra mi'racê esra ku hat eşşeh bi Quranê
29. Dê **Enwer** tu bigir 'ibret hezar salam hezar reḥmet
Tu bîne der ji qelb û can ku emr e ev bi Quranê
30. Guneh gelek li te hene tamam 'eyban ew ê te ne
Temam rîyan li te girtin bike rica li Quranê
31. Li Muḥemmed bike zarî bibe kelbê li ber derî
Li ber mirnê ku bêt hewar Ṭaha Yasîn li Quranê

32. Di heşrê da ku ket gazî bibêj kelb im tu bibezi
Dirêj ke defter û kitab şefa'et ke li te Quran
33. Ka 'umr û can û ciyê te ka şan û şeref bextê te
Ji hev qetyan fayde neda îlla digel te ma Quran
34. Ji Quran min dûr neke ji rehma te hêvîdar im
Di mirn û qubr û heşrê da bi hürmeta vê Quranê
35. Dema rûhim cesed cuda ber serê min yekî xwenda
Bi dengê xweş min jî gota bide xatirê vê Quranê

4. (Li Ser Muḥemmed Eḥmed)

1. Kan mefxera pêgemberan kanê taca serê hemyan
Kan hevalê şidqa tamam kanê Muḥemmed Eḥmeda
2. Kan Farûqê kurê Xeṭtam îman anî pê ferqê kir
Ew fatihê Qudsa Şerîf kanê Muḥemmed Eḥmeda
3. Kanê 'Usman(ê) zîl-nûreyn³⁴ ku şehîd bû li ser Quran
Dema hatî dikir qedûm kanê Muḥemmed Eḥmeda
4. Kanê gelo şahê meşhûr ew fatihê Xeybera Kuffar
Ku ew babê cotî şêran kanê Muḥemmed Eḥmeda
5. Kanê enşar kan muhacir kanê Ḥesen xudanê tac
Kanê Huseyn ku bû şehîd kanê Muḥemmed Eḥmeda
6. Kanê Eyyûb digel ḥuznê kanê Yehya Xudanê xewf
Kan Suleyman tevê mulkê kanê Muḥemmed Eḥmeda
7. Ka hûn 'ibret bigrin ji van şenadîdê mezin
Şerim biken ji dînê temîz kanê Muḥemmed Eḥmeda
8. Kanê Şeddad xweyê qewmê kanê Qarûn xûdanê mal
Kanê Nemrûd ku kir tuğyan kanê Muḥemmed Eḥmeda
9. Kanê Fir'awn kan selṭenet kanê heman xudan dewlet
Kanê Ebûcehlê murted kanê Muḥemmed Eḥmeda
10. Dînsiz rabûn dîndar xuyan temelê dîn qed nehêlan
Mu'min ketne li ser riyan kanê Muḥemmed Eḥmeda

³⁴ Hz. Osman (Pala 2007, r. 365.)

11. Zalıman zılmê pur kirin şêx û melan 'idam kirin
Pal û rêlan tercix kirin kanê Muḥemmed Eḥmeda
12. Kafir eşem eşqer hatin tedrîs û Quran rakirin
Namûs şeref li wan neman kanê Muḥemmed Eḥmeda
13. Edeb çarşef li hev wer bûn li ser Islam kufr ser bû
Yetîm feqîh suṭûxar man kanê Muḥemmed Eḥmeda
14. Hecc û zekat tev bûn rûmet mêj û îman ji bo peran
Şefaberî riba xurman kanê Muḥemmed Eḥmeda
15. Wan 'alimê ku 'ilimdar ew 'eskerê tev namidar
Ketin li ber emrê kuffar kanê Muḥemmed Eḥmeda
16. Mîr û amîr muftî millet ti wan da qet nîne geyret
Jin û qîzan kirne hewar kanê Muḥemmed Eḥmeda
17. **Enwer** du 'a nabin qebûl mêj û rojî te kir ḥisab
'İlm û kerem te ba xwe dî kanê Muḥemmed Eḥmeda
18. 'İlm û cihad te terk kirin dost û heval winda kirin
Wê axir da dê tu bimirî kanê Muḥemmed Eḥmeda
19. Mexrûrê 'ilmê xwe nebe da'ima ser 'ehda xwe be
Ricakarê şeyxê xwe be kanê Muḥemmed Eḥmeda
20. Me'şûqê Norşîn Xeznewî bigre heta şahê berê
Bin peyrewê te **Enwerî** kanê Muḥemmed Eḥmeda

5. (Heqê Dinyayê da)

1. Eya dunya eya dunya wê dunya 'ê mel'ûn³⁵ê pîs
Kanê 'ehd û kanê wefa eya dunya mel'ûnê pîs
2. Kanê 'ilm û kanê ḥikmet kanê şan û kanê şuhret
Kanê Islam kanê ummet eya dunya mel'ûnê pîs
3. Kanê xizm û kanê millet kanê îman kanê Quran
Kan şerî'et kanê sunnet eya dunya mel'ûnê pîs

³⁵ Ew kesê ku hatiye naletkirin. Yê hatiye qewirandin. (Ferit Develioğlu, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, Aydın Yayınları, Ankara 2003.)

4. Kanê xêr û kan bereket kanê şerm û kanê şefqet
Kanê can û kanê şihhet eya dunya mel'ûnê pîs
5. Kanê Adem kan Muhemmed kanê çihar şed û bîst
Hezar nebîyyû bi tamam eya dunya mel'ûnê pîs
6. Dîndaran dîn winda kirin kufr û nifaq destek kirin
Gelek xelqan hizmet kirin eya dunya mel'ûnê pîs
7. Êdî ji te nabit umîd dunyayê pîs û bê wefa
Namûs heya û 'ar nema eya dunya mel'ûnê pîs
8. Bê bext û xa'în bê wefa feqî murşid û şofîyan
Eşlê tahir qet jê neman eya dunya mel'ûnê pîs
9. Qetla Islam te kir mode jin û keçan tazî kirin
Mêr û biran gîret neman eya dunya mel'ûnê pîs
10. Dê û qîzan tevda birin gel hev ewan dansê kirin
Zina fuhûş ifşa kirin eya dunya mel'ûnê pîs
11. Riba³⁶ û şirkê 'am kirin tamam ewan reklam kirin
Wan bê dînan xirab kirin eya dunya mel'ûnê pîs
12. Hîfzke ya Reb Ilahî dîn û îman milletê min
Ji kufr û zulmeta Şeytan eya dunya mel'ûnê pîs
13. Bike xilaş min da û bab di nez'a mewt û mergê da
Ku dûr ket Şeytanê mel'ûn eya dunya mel'ûnê pîs
14. Ricakar im umîddar im bi lufta Raħimê Reħman
Bi hummet Eħmedê Serwer eya dunya mel'ûnê pîs
15. Ebûbekir 'Umer 'Usmanê zîn-nûreyn digel 'Elî
Bi zîncîra Neqşê Norşîn eya dunya mel'ûnê pîs
16. Ku bêtin seyda şêxê min bi telqîn û bi şehadet
Bi aşkere weşiyet kem eya dunya mel'ûnê pîs
17. Bi xweşîyû we dilgeşî dema terk kem vê dunyayê
Bi Yasîn û bi şehadet eya dunya mel'ûnê pîs

³⁶ Riya.

6. (Li Ser Ҳалê Xwe)

1. Dilo rabe tu hazir be ji bo çend gurz kelam min
Ji heddê xwe zêde key tu dibit birîn zimanê te
2. Dilêm daye ku ez bêjim tamam sûc û xeṭa'ê xo
Dikem zarîyû fiğane ji ber zenb û gunahê xo
3. Nema taqet li te **Enwer** ji ber dilg û gunahê te
Nema çare ji bo 'umrê zeman borî çû ji dest te
4. Dema 'umur li te borî dê çewan be li halê te
Dê bes e qal û qîlan ke here 'efwa xo rica ke
5. Dê³⁷ rabe tu bes e bigrî temaşe ke li halê xwe
Giran bûye ji hed zêde bike çare li halê xwe
6. Biger tamam ji fi'lê reş ku raḥet bî di qebra xwe
Çare ji ber gunhê di pîs 'ezim bike carek li xwe
7. Here li nik Hezretê Şah şêx û pîr û seyda'ê xwe
Qena'et ke tu raḥet be nebêje min guneh pur bû
8. Bide destê bike tewbe dil û can û bi rûhê xwe
Ji 'efwê ra ḥudûd nîne eger şirkê nekey pê ra
9. Ji gunehan bes e efğan ke ta'et û zîkr û şebir pê ra
Di nav keyf û gunehan da ḥeta kengî tu yê ha bî
10. 'Umur li te çîlan borî heval çûne li rê ma'î
Wa **Enwer** tu bike zarî ji ber gunhê xwe ê tarî
11. Bibe kelbê li ber derî ji bo fexrê ka'inatê
Selama Heq li **mîmê** bit eger **ha**'ek li ber danî
12. Bi weşla **mîmê** bit ew **ha** eger **dalek** li ber danî
Dibit ismek mukemmel ew ji bo fexrî ka'inatê³⁸
13. Dibim turab li ber pa'ê bi eşhab fexrê ka'inat
Çiqas şelat bê hed selam li ser rewza Medîne bit

³⁷ De.

³⁸ Helbestvan di malikên 10-11an de navê Muhemmed daye.

14. Li al û ezwacu eşhab li ser yar fexrê 'alem bit
Dibêjit **elîf nûn waw** eger **ra**'ek li pey danî³⁹
15. Kitabet nezmê tamam kir li ser gunhan barek danî
Kû 'eyn bêtin ji elîf da gava cebel diçe hezfi
16. Kû 'efû hat ji ber hê waw hezar 'eyn bê têxit cezbê
Ku cezba şofiyar têtin ji ber zikrê huwel-baqî⁴⁰
17. Ku 'işqa 'aşiqan rabin ji ber 'işqê dibin saqî
Ji 'işqa haciyar Lebeyk⁴¹ dibêjin ew li dor beytê
18. Dikin tesdîqa Rebbê xwe digel hev ew dikin se'yê
Temamê van dikin recmê dibêjin mel'ûn 'ezazîl
19. Dibêjin tekbr û el-ħemd diçin girê 'Erefatê
Temamê van cemi' dibin di celwa Ismê E'zê da
20. Xetim dikem kelimê xwe ku ni'metek Xuda wer da
Hezar medħ û şena pê ra dikem pê ra diçim secde

7. (Heqê Seyda'ê Xwe da)

1. Dilo bulbul dilo kovan kî bêj mihvan li te seyda
Dê weqtek bêt ku bawer kem ku bêjin hatiye seyda
2. Şukur secde li min ferz e ku bêj hatî li we seyda
Dilo rabe gelek şa be ku mihvanê te bit seyda
3. Bi xêr hatî ustazê min bi ser çavê me ra hatî
Li me nêzîk dibe qurban wê bim qurban li we seyda
4. Mufferreħ kir dilo canan Muħememd Sirriyû û seyda
Li me qelbê melûl şa kir ku hatin ewladê seyda
5. Zivistan çû bihar hatî dikem qeşda yedê seyda
Be'îdim ez ji ixwanan me keyf nîne ji bil seyda
6. Çehvim bigrî dilim şa be ku iħsan kir li te seyda
Ji ehlê xwe tu jî ferdek ku puşt 'emmet xeten seyda

³⁹ Di vê malika helbestvan mexlesa "Enwer" bi herfên Erebi daye.

⁴⁰ Helbestvan di malikên 15-16an de bi hesabê ebcedê tarîxa nivîsîna diwançeyaya xwe daye.

⁴¹ Keremkin, emir yê we ye ezbenî (Develioğlu, 2003, r. 545.)

7. Bike hemdê digel şukrê ku neseb da wekî seyda
İsmê Hesen xulqê ehsen tamam ‘ilman li bal seyda
8. Terîqê da dibe Neqşî lê mensûbê mala seyda
Eşil dibin Imam Xalid nesebe ew ji bo seyda
9. Wetenî wî Karçikane Kavaş meqame ji bo seyda
Muhammed Sirriyû Nacî dibin ewlad ji bo seyda
10. We Racî Saqî yû Salim ev in her şey kurê seyda
‘Ebdulletîf Muhammed Samî wefat bûne berî seyda
11. Mela Huseyn Mela Se‘îd ev in her du birayê seyda
Bi zarîyû hewar im ez sûtûxarmam li ber seyda
12. Bi curmê xwe be‘îd ketim bi qelbê xwe li bal seyda
Xuda Rebbî ricakar im di nez‘a mewt meded seyda
13. Di qebr û heşr û neşrê da bike hummet eya seyda
Li **Enwer** hûn bibin hişyar kelbê we ye eya seyda
14. Dibin ela ya Muhammed bikêş dest im eya seyda
Di axir Cennet û Firdews bi rehîma Reb eya seyda
15. Di wê darê da bin cîran digel Şidîq û hem seyda
Bi Farûq we zîn-nûreyn we Heyder ra eya seyda
16. Digel ewlad im qîza te ber hev bin em li dor seyda
Hemî da û bab û yaran Ilahî ket neşîb seyda
17. Di wî rojê gelek şa bin ku bibêjin ha ev e seyda
Gelî xwendekar û guhdar bêjin amîn digel seyda
18. Nekin lewme eya ixwan dê bimrim ez ji bo seyda
Kalamê xwe ez ê bes kem dest im bigre eya seyda
19. Dema rûh bête ser şing im bike imdad eya seyda
Bi dev lêv ez bidim şehde bi qelb iqrar eya seyda

8. (Teleba Şefa‘eta Resûlullah)

1. **Enwer** rabe bike feryad li ewlad gencê zemanê
Werin gel hev bikin gazî bibêjin ya Resûlullah

2. Ji pîs û kufreya çewrê jin û Şeytanê zemanê
Biken cihad ji bona dîn bibêjin ya Resûlullah
3. Zemanê zulmet û hîlan ketim nav mewc û nav pêlan
Nema xeyrek di dest im da ji geyrê te Resûlullah
4. Bike imdad eya şah im bi derd û êş û pur ah im
Tebîbê min tune mah im ji geyrê te Resûlullah
5. Eger pur 'işyan û 'ar im xeşa zehf gunehkar im
Ji rehmê hêvîdar im hêviya min Resûlullah
6. Xeşa'ê min ji hed zêde ji vî derdî ketim rê de
Serê min da êşek zêde dewa ke ya Resûlullah
7. Dewa derdê tevê 'alem hewar e Nûh û hem Adem
Cemî'ê enbiya xatem Hêbîbê Heq Resûlullah
8. Hewar e şed hewara min ji ber êşa gunahê min
Kî ye xweş ke birînê min ji geyrê te Resûlullah
9. Tu yî serwer di nîv heşrê tu yî şafi' li bal cîsrê
Ey 'alem pê dike fexrê tu yî Wellah Resûlullah
10. Ha **Enwer** tu bike zarî ji bona te gunahkarî
Li te imdad neke zarî nîne geyrê Resûlullah
11. Ey nûra şeva tarî şefa'et ke li wî warî
Îzin da te Xuda Barî şefa'et ya Resûlullah
12. Lê zêde muznib û pîs im şon 'aqîbet belê tîrsim
Di 'işyan da xeşarês im bike imdad Resûlullah
13. Gunahê min ji hed rabû ji ber êşan reng im zer bû
Li xeşa'ê xwe lê wer bû bike tahîr Resûlullah
14. Ji ava kewserê wer ke bo cismê min muşerref ke
Enwer kî ye lê kerem ke ji geyrê te Resûlullah
15. Temam gunhan bike tewbe 'umrê te çûye bê fayde
Di qeydê da esîr mame xilaş ke min Resûlullah
16. Ji van qeydan tu min ber de dibin zemîn li ser erd e
Di heşrê da kî xeber de ji geyrê te Resûlullah

17. Dê bigrim heqê 'ê babe ku Rebb im bêje tu rabe
İzin min da ye tu şa be ji geyrê te Resûlullah
18. Bi wî şahiyê min şa ke ez im ketme tu min rake
Ze'îf im lê îman pak e bike hummet Resûlullah
19. Bike hummet eya serwer li 'ebdê muznibê **Enwer**
Di gunhan da li ber her kes hewar were Resûlullah
20. Li ber mîzan neke j' bîr e lê pur zarî yû we qîr e
Li wê kî şah e kî mêr e ji geyrê Resûlullah
21. Ji axir gotinê nezmê bike şena digel hemdê
Bibêj el-ğemd ji bo Rebbê digel ne'tê Resûlullah
22. Resûl ew e Xatem ew e di dareyn da imam ew e
Ji bo Rusûlan imam ew e imam e hem Resûlullah
23. Hezar can û we serê min digel her şey û şanê min
Digel bab û birayê min feda bin ji bo Resûlullah
24. Hezar şelat û hem selam ku derkevin ji her devan
Ji bo Şiddîq û Çar-yaran ji te ra ya Resûlullah
25. Ji Hesen ra ji Huseyn ra ji diya wanê Faṭma ra
Bilal Selmanê Faris ji te ra ya Resûlullah
26. Imam Şafi' Imam Henbel Imam E'zêz û Malik ra
Tevî eşhab û enşaran ji te ra ya Resûlullah
27. Ji bo kesê ku xwendekar guhdar e yan heval e
Ji bo kesê biket du'a ji te re ya Resûlullah
28. Ji bo min da û babê min ji 'eyal û birayê min
Ji Şêx Me'şûq⁴² seydayê min ji te re ya Resûlullah
29. Bi heqê Eḡmed û Maḡmûd du'a'ê min neke merdûd
Di heşrê da neke meḡcûb ricakar im Resûlullah

⁴² Şêx Me'şûq li Norşînê postnîşînekî terîqeta Neqşebendîyêye û li herêmê gelekî navdar e, di sala 1975an de wefat kiriye. (Eş-Şeyh Muhammed Maşuk Norşîni (K.S), Râh-i Aşk, <http://www.rahiask.com/index.php/tetebbuat/126-naksibendiler/tahiler/631-es-seyh-muhammed-masuk-norsini-k-s> (Dema gihandinê: 04.01.2022).

30. Di heşrê da ez ê mînim zebanî bikne gazî min
Ku qeşd ken ew jî min bigrin bibêjim ya Resûlullah

9. (Fîgana Bal Fexrê 'Alem ve)

1. Hatme ber dergahê te ey şahê 'alem el-meded
Dikem zarî yû fîğan e şahê 'alem el-meded
2. Perîşan û suţûxar im ey Mehemmed Muştefa
Destegîr im qeţ çû nîne şahê 'alem el-meded
3. Dê hewar kem ez ê rûreş eş û janek da serê min
Destê vala suţûxar mam şahê 'alem el-meded
4. Pur perîşan û ze'îf im ya Ilah-el-'alemîn
Were imdad Babê Faţma şahê 'alem el-meded
5. Pur bi cahê te xilaş bûn mişlê rojê aşkere
Şed meded ey nûrê çeşmê şahê 'alem el-meded
6. Me bi te qîr û hewar e ey Resûlê ins û cin
Ber derîzana te kelb im şahê 'alem el-meded
7. Min gunah bûne hezar bar hêj dibêm ew hindik e
Were imdad ey resûl şan şahê 'alem el-meded
8. Dergehê luţfê veke bo feqîrê **Enwerî**
Tu bi hummet min qebûl ke şahê 'alem el-meded
9. Can birîn e çare nîne çare nîne ey şefî'-ul-muznibîn
Hêvî hewara min were şahê 'alem el-meded
10. Şefqet û luţfê dixazim ey Hebîbê namidar
Rehmê ke li **Enwer** şefa'et şahê 'alem el-meded
11. Luţfê ke hummet şefa'et ey Resûlê şequeleyn
Her tu yî meqbûl şefa'et şahê 'alem el-meded
12. Wer hewara min heqîrê pur feqîr im ba umîd
Tu bibe penah ji bo min şahê 'alem el-meded
13. Dê çi bit halê di min gunehê min mişlê çîyan
Şed hewar eşrefê 'alem şahê 'alem el-meded

14. Bibme Qiţmîrê derê te fexrê ‘alem el-meded
Bême ber deryê te razêm şahê ‘alem el-meded
15. Pur li ber sûcan dinalim ey Hebîbê namidar
Şed hezar car min tewbe ye şahê ‘alem el-meded
16. Min feqîrê wî hewar e dilo cergeyn min birîn
Bêje **Enwer** bes binale şahê ‘alem el-meded
17. Tu bike mehder li **Enwer** tu re’îs-il-enbiya
Bibe cennet wî bi xwe ra şahê ‘alem el-meded
18. Tu rica min qebûl ke bêkes im ez pur gêrîb
Her zeman canim feda bit şahê ‘alem el-meded
19. Ax û ahê min ji dil tê qelb û cîger min bû birîn
Rêyû rêçan me winda kir şahê ‘alem el-meded
20. Wer hewara min feqîrî rake derd û kederan
Bes binale li te imdad şahê ‘alem el-meded
21. Were imdadim li mirnê hem li heşrê ber mîzanê
Tu ‘efû ke muznib **Enwer** şahê ‘alem el-meded
22. Ah ji destê van xilafan zêde cewra zarûwan
Têne ser min wan bi hiddet şahê ‘alem el-meded
23. Min û wan da tu xilas ke nûra her du çavê min
Luţf û îhsana te ‘am e şahê ‘alem el-meded
24. Dewra cehl û mekteban e qeţ naken ‘ilmê i‘tîbar
Şax û şolan min xilaş ke şahê ‘alem el-meded
25. Şal hezar neh şed û neh wêd û heftan bit-temam
Bûne mani‘ dersê Quran şahê ‘alem el-meded
26. Deryê demir li me girtin nabînin meqşûd ebed
Cehl û Şeytan ‘esker bitin şahê ‘alem el-meded
27. Baqir û cîn û menafîq bûne sedda dînê te
Nede wan furşet Ilahî şahê ‘alem el-meded
28. Bike yardim necm û millet necmê dîn ra bit penah
Da bibit xweşyû serbestî şahê ‘alem el-meded

29. Rutbelî şewcîyû hâkim xwendekarê mekteban
Bûne duşmanê dînê me şahê 'alem el-meded
30. Bes binale bes bikale **Enwer** halê te bireş
Li te imdad û gazî bêt Rebbê 'alem el-meded
31. Ya Ilahî hemd û şena tevê medhan ê te ne
Ez û ewlad bibin qurban şahê 'alem el-meded
32. Ya Ilahî bike şabit dîn û îmanê di me
Bike hummet da xilaş bin şahê 'alem el-meded
33. Ya Ilahî tu 'efû ke min **Enwerê** rû bireş
Bike şafi' ya Ilahî şahê 'alem el-meded
34. Hemî şelat û selaman ji bo Ehed çar û şeş
Tu dizanî ku 'elîl im şahê 'alem el-meded
35. Ez feqîr im pur bê halim ji dunyayê ker û lal im
Hêviya Rebbê Geffar im şahê 'alem el-meded
36. Ji 'işqa te ezê lal im şev û rojê bê qerar im
Ez nexweş im pur bê hal im şahê 'alem el-meded

10. (Li Ser Hâlê Ğurbetê)

1. Min firqet dît nexweş bûm ez ji 'işqa te kebab bûm ez
Min firqet dît ku bibînim ez lê çi kem bê mecal im ez
2. Min firqet dît zelîl bûm ez ji dîwanê revîbûm ez
Min firqet dît xirab bûm ez li nik hinan 'ezîz bûm ez
3. Min firqet dît heqîr bûm ez ji 'işqa te gerîb bûm ez
Min firqet dît nezan bûm ez lê çibkem bê delîl bûm ez
4. Min firqet dît biçûk bûm ez nexweş û pur 'elîl bûm ez
Min firqet dît rojê carek dibim mecnûn dîwane ez
5. Min firqet dît di Ğerzan da êdî carek nebînim ez
Min firqet dît be'îd bûm ez her roj her gav dihelam ez
6. Min firqet dît di beytê da her roj carek xiyalê da
Min şey'ek dît di xewnê da şîn û girîn li min peyda

7. Ez li cem wî di mewtê da wê min têxin di qebrê da
Dema ku ez kemalê da lê bêhna gefletê lê da
8. Min dî axek di firqê da firaqa weşletê lê da
Her roj her gav xiyalê da dema min dît gerîbî da
9. Min dî hinek di husnê da husn û cemala ku tê da
Çi ku derdek li min peyda ji bo husna Hebîbê da
10. Min firqet dît di şerqê da yeka dîtir di beytê da
Wekî perwan di 'işqê da di ber bejna şemalê de
11. Firaq dît û hinek weqtan dema ku ez li cem seyda
Dema derdek bûye peyda diçûme ez li bal seyda
12. Eman seyda eman seyda tu napursî li van derda
Çê bû derdek li min peyda ez şewitîm gerîbê da
13. Min divêtin heyatê da firaqa weşletê lê da
Ezê çî bikem ji bil seyda lasiyema di gerîbê da
14. Ez im rûreş û rûsiyah ketim çolê di Ğerzan da
Ez im dikem feryad hewar tamam 'alem rakem peyda
15. Şûc û xeşa'ê min eva min 'efû ke eya seyda
Di heşrê da were hewar hêviya min rehîma Xuda

11. (Heqê Nûra Xuda da)

1. Bi xêr hatî delalê min bi ser çavê me ra carek
Li me nêzik bûye qurban bibim qurban we yek carek
2. Mufferreh kir dil û canan eya xortê xudan hummet
Li me qelbê melûl xweş kir ku hatî memleket carek
3. Zivistan çû bihar hatî tuyûran şahiyek danî
Be 'îdim ez ji ehbaban me keyf nîne qe yek carek
4. Ji qelbê xwe birîndar im cesed ve hem ze'îf jar im
Ji her salan xwezî par im vi rê ke⁴³ bo me dermanek
5. Di bağan de pur in bulbul ji 'işqa dil ew in dil kul
Ji derdê dil dinalin pur xuya naket li me yarek

⁴³ Vi rê ke: Bi rê (bi)ke.

6. Li me firqet bûye zahir kulên dil da belê mahir
Xuda weşlê bike haşil li ser qelbê me jê carek
7. Ku dîlber dî bi meş tê xweş li ser qelbê min ê nexweş
Hezar gulam ku bèn pê ra li ser min be wekî carek
8. Gelfî dostan çira nehat dê 'işyan û we feryad kem
Hal im nîne di dunya da ji bo xatrê yarê carek
9. Gelo dîlber xeber hebû kû cîger im pare par bû
Bi hummet cerhan melhem ket bi dest û tilyê mubarek
10. Ji ber perde ku bête der niqab rake were henber
Li pêşber im tu yî qible dikem secde ji bona yek
11. Hezar hemd û hezar şena şukr û minnet ji Rebbê min ra
Ku dîsa hate pêşber im ku destûr da li me carek
12. Hucûm anîn ewan yaran bi hezar tîr û mertalan
Esîr mam ez li ber pê yar ji ber husn û xulqê melek
13. Ne insan bûne melek bû li dîlber husnek wek hebû
Ne j' cinnan e ne insan e ne gilman hûrî ew melek
14. Dema ku yar xuya wê da hezar wek min di vê rêda
Her roj her sa'et carek di ber pê yarê mubarek
15. Eman heval eman ixwan selema min li we şed car
Werin gel hev biken zarî biçin carek li ber derî
16. Hezar şah û mîran rakem bikem qeşda derê yarê
Ku azad ke ew padîşah bixazit ew qabil carek
17. Dizanin ku cîger kewand şîş jê kişand xwelî reşand
Emir kir got ne nalîne ji bona te yek selamek
18. Li ser te hem tamam yaran bi şubhê gul giya baran
Li wifqa mahê nîsanê selam **Enwerê** jarik ra

12. (Li Ser Hâlê Miletê Bêkes)

1. Ey felek dîsa te kul kir derd û êşanê di min
Mişlê bulbul meylê gul kir zad û efgan di min

2. Şerbeta lefz û kelaman her di nav wan taş û caman
Daye cumle xaş û ‘aman can û fincanê di min
3. Cam û fincanê Celîlê daye destê min zelîl
Xoş li halê min gerîbê best û dîwanê di min
4. Gah xef in gah aşkera nin her di nav ‘amê belav in
Mîslê rojê aşkera nin xal û nîşanê di min
5. Mulk û mişr û burc û eywan bağ û cennet ca û rişwan
Ew sema û mah û seywan text û dîwanê di min
6. ‘Enber û bihna buxûrê meş‘ela Sîna û Tûrê
Menbe‘a eva tûhûrê tê ji zozanê di min
7. Sunbul û reyhan û pûşî gaharan berxende gûh
Eşles û dîbac furoşî bağ û bostanê di min
8. Saqîya ava heyatê şems û wechê li nebatê
Ey dilo carek nehatî hur û ‘gîlmanê di min
9. Zulf û kafan helq û dalan Hindî yû Zengî yû xalan
Her teref wan bir bi talan can û cananê di min
10. Hêlqe û zulfên di yarê şubhê şemsa ber gulavê
Kir teji ba‘ê biharê ceyb û dama‘ê di min
11. Çend kelamek gotinê min bi delal û nazenîn
Zarê Kurmanc ku bixûnin beyt û dîwanê di min
12. Da bizanin em jî Kurd in ji diyarê em vemiştin
Ji bo zaran gelek xişt in ‘ar e namûs e li min
13. Çi li me hat gelî Kurdan hev dikujin ji bo peran
Mane esîr serê çîyan mîr û xandarê di min
14. Da werin Kurmancê guhdar neken zulm û zîletê
Neken buhtan hev nekujin kanê dîn û çîrayê min
15. Di dunya da hema her kes kirin destek bûne dewlet
Dîn û emlak ‘ilm û ‘îrfan nema yekser mîletê min
16. Di dunya da çîqa eqwam li hev kom bin ji bo Kurdan
Çewan kuştin kifş e mîran xwişk û bûk birayê min

17. ‘Ar û namûs şan û şeref tamam hebû milletê min
Çi li me hatî gelê Kurdan hev dikujin ji bo dujmin
18. Kurd û Islam bira ne kirne qîrek wek eşlan e
Kurd û Zaza civat kirin ka çi bêjin melayê min
19. Gazî kirin beg û ‘ağan da bikujin şêx û mela
Da bidîne wan bi tiran peran qetil bikin milletê min
20. Wêca li min van kafiran çewan kuştin jin û zaran
Nebên⁴⁴ mani ‘ê cuhhalan şêx û mîr û melayê min
21. Kufr û dewlet mîr û meclis ewan tevda peyman kirin
Didin kuştin ji me Kurdan ta nemînit birayê min
22. Gelî Kurdan danin tivek biken de‘wa bibin millet
Xwezî weqta Kurdî dewlet bidîta min melayê min
23. Kira qîrek gota millet eva heqqî eva dewlet
Şerq û gërb Kurd bûne dewlet da bimirin dûjminê min
24. Kurdî dewlet Îslam millet bi dilxweşî bibin gel hev
Da xilaş bin li bin zillet canim qurban milletê min
25. Biken de‘wa Şêxê Zîlan bêjin ev riya kalê me
Şêxê Xanî Se‘îd Nûrsî⁴⁵ nekin inkara riya min
26. Ku Şêx Samî Azircanî Şihabûddîn weledê Ğews
Kirin de‘wa weşen millet zêde cihada dînê min
27. Ku rabûye Xelîfe Selîm ji bo şihhet selama dîn
Ku Seyyîd Diho Seyyîd ‘Elî evan zatê mezinê min
28. Bi Koroğlî Huseyn Paşa Xalid Sibkî we Berzanî
‘Ebdurrehmanê Xerxûrî di eşlê da bapîrê min
29. Kanê Bozbek Hemîd Paşa Feqe Xelîlê Hirîyetî
Şêx ‘Izzeddîn û Qasimlo kanê Tahir Ağayê min
30. Şed hezar sêşed û can bin qurbana weşanê min
Da werin gel hev bira bin eva xoşya milletê min

⁴⁴ Nebin.

⁴⁵ Se‘îdê Nursî di sala 1877an de Hîzanê hatiye dinyayê û di sala 1960an de wefat kiriye. (Bediüzzeman Said Nursî, **Tarihçe-i Hayatı**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2004, r. 34.) Se‘îdê Nûrsî alimekî serdema xwe bûye.

31. Şêxê Şerîfê Kelxî bû Keleş 'Ağa Hëllacî bû
Bazîd li wî 'Uzeyr 'Ağa xeniqandin gel şêxê min
32. Mela Cemîlê Mîsanî Se'îd 'Ağayê Gencûrî
Hacî 'Ağayê Kirnûsî evan can dan milletê min
33. Bedirxan bû mîrê mezin ji nesla mîr 'Imaduddîn
Hezar zâtê serî manî kirin qurban welatê min
34. Çiqa qedrê te mezin bû welat can û welat şîrîn
Ziya Şerîf Xan û Candan tamam mirin welatê min
35. Qazî Muḥemmed Isma'îl 'Ağa Lezgîn 'Ağayê Giravî
Ji medresê gelek şêxan qetil kirin delalê min
36. Hëmid Paşayê Başkanlî ji nesla Ğewsê Hîzanê
Doktor Fûad 'Erebkendî canê xwe dan milletê min
37. 'Ebdurreḥmanê Aqtepî ji weled Şêxê Nûranî
Di 'ilmêda li ber her kes di weznêda rehberê min

13. (Li Ser Qelbê Zelal Hevalê Taze)

1. Ey dost û yaranê di me mêze li ser qelban bike
Derd û kulan hêlûn vedan taze li wan bû ye bihar
2. Xwezla bidîta min tamam dost û hevalanê di xwe
Temamê kul derdê di min taze ji dil tê bahta der
3. HÛbba heval dost û yaran maye li dil da hey hewar
Milyon selaman merḥeba rêkem ji bo wan yadîgar
4. Bêt selama dost û yaran li ser qelb û çavanê bit
Gelek zêde bi xweş dibin dema ku cardî hat bira
5. **Enwer** were bes e razê de hişyar be li te gazî
Heval çûne hêj tu razê tevî mulk emlak dixazî
6. **Enwer** 'umur te xilaş kir heçî çûyî te zerar kir
Ji bo dunya li ber her kes ḥeta kengî bibî razî
7. Birayê dîn û dîndar be digel te her zeman yar be
Wê ji ḥalê te xeberdar be bi hummet ew xeberdar e

8. **Enwer** bes e tu feryad ke wê hewara te bêt bira
Mela Edhemê Berwarî bi qelem qelbê te kew da
9. **Enwer** ya Reb Xuda'ê min tamam dost û hevalê min
Ewan 'uşaqê mîna min xilaş bike di heşrê da
10. **Enwer** halê te tunîne çiqas qelbê te birîne
Hisaba qebrê xeyr nîne ka zivre car kî tewbe ke
11. Vê tewbê tu xirab neke de belkî bête ser ce'dê
Ewî qelbê tu xalî ke xirab xanî taze çêke
12. Ewî textê tu hazîr ke bi nefis û 'adetê neke
Heram şubhê daxil neke ne ew e textê şahê te
13. Le'în mel'ûn tu jê dûr ke ku mîr bitin li wê rûne
Ku hakim li her du cihan bê guman ket rehîmê li te
14. Di weqtê mirn û rûh danê bi zimanek xweş de şehde
Temam gunhan ji te dûr ke bide xatîrê Hebîbê xwe
15. Di qebrê da cewabek xweş bike teşdîqa Rebbê xwe
Bike yardım Xuda b' te ra bi hummeta Hebîbê xwe

14. (Heqê Miletê Mezlûm da)

1. Rebbim 'inayet bike hidayet
Mezlûmo hûn jî bibin dewlet
2. Bi jîna millet bibêjin ya Reb
Xa'înan nehiştin ku bibin dewlet
3. Çêkin civatê biden heyatê
Xweşiyû jînê ku bibin dewlet
4. Bihêlin xûnê cahil nemînin
Xweşiyû rehîtî da bibin dewlet
5. Ku hucûm da min bab û birê min
Kanê mamê min ji bo riya min
6. Nebêjin kanê rojekî hanê
Gel hev neyar bûn xûna min kanê

7. Kurdê delal gel we bit Barî
Gel hev bi dest bin ji bo weşanê
8. Delal û Zîn in cîger birînin
Gel jiyana dînê neken neyarî
9. Heyfa ciyê min şeyx û melayê min
Beg û aqayê min bîne dujminê min
10. Kurdê dilxazî Zaza û Çerkez
Xweşiyû mirin ji hev bin razî
11. Ey gelî Kurdan delal û rindan
Xweşiyû jînê bi çavan bibînim
12. **Enwerê** bêhal bes bike hewar
Dunya tev neyar e zêde van Turkan
13. Utruk û wel-Turk Turkan bihêle
Ev gotina han ê li derê min
14. Ev Kurdê mezlûm heqîqet rabûn
Çûne mirinê ji bo dînê min
15. Kurdê delal in serê çiyar in
Cennet weşan in kanê heqê wan
16. Cihê me Kurdan çiya' û zozan
Li hev bûn neyar nema heqê wan
17. Heqqê wan girtin miletê zalim
Nehêlan bixûnin da mînin cahil
18. Heqqê winda ken gundan xirab ken
Zanayan bik'jin da mînin cahil
19. Da mînin bindest nebînin dewlet
Nebêjin milet kanê heqqê wan
20. Nebêjin aha halê me wiha
Dê mînin wiha heta dunya ava
21. Ya Reb dilxaz im ji dil niyaz im
Hakimê mutleq rehber e Muhemmed

22. Dizanim mutleq rojekê wê heq
Tecellî ke el-heq li bal Muhemmed
23. Ya Rebbê Ğeffar bi ismê Cebbar
Zalimê red ke mezlûm bibe pak
24. Ya Rebbê Celîl ev qewmê feqîr
Qehrê ke zalim milletê nepak
25. Cihada heqqê me danî erdê
Gotin Ermenî me serî danî
26. Xêr û camêrî 'ilm û 'edalet
Namûs û ğîret ê me Kurdan bî
27. Me got were serê me bibire
Ji bona pere em dê bin ceşkere
28. Evan perê han ji bo aĝayê wan
Bêjin bûkê wan werin bib'ne kere
29. Şeyxan qebûl kir melan xwe dîn kir
Milletê feqîr jî silah rakir
30. Ceşiyet ev bû heqîqet weha bû
Neyar kafir bû avan xirab kir
31. Jin û xûşkê me bûne mêrê me
Qîz û bûkê me cihê aĝayê me
32. Van qîz û jinan tev girtin dîlan
Derketin çîyan cihê mêrê me
33. Van qîz û lawan digotne milan
Kanê heqê me hûn bînin ziman
34. Melayê bêwijdan digotne Kurdan
Em hemî biken gotina paşan
35. Evê dewletê gote milletê
Em û hûn çêken biken xidmetê
36. Gotinê milletê nekin hûrmetê
Ji bona evan melan bûn bela

37. Gawur e kê dî ji mektebê tê
Ji me ra şandin eva cihê mela
38. Xoce'ê cahil gelekî zahir
Ji xelqê mezlûm heyfa xwe rakir
39. Mela cahil man gelek jî tê min
Milletê ceşşik ji wan ra gulam
40. 'Alimê berê gelek jê welî
Eşil tahir bûn xelqê pê nekir
41. Gotin ev xoce gelek jî taze
Eşlê wî kî ye ji me ra çi ye
42. Dengê wî xweş e banga wî ...
Haşa cum'e beçal e ji me ra çi ye

15. (Heqê Mezlûman da)

1. Neken inkar eya zalim heqê mezlûm û dîndaran
Werin em hûn bikin şer'ê weya jî qanûna insan
2. Digel hev em hezar sal man li ser we me hukum nekir
We hukmê xwe gelek zor kir bi zulmê heqqî winda kir
3. Bi heqqê heqiyê el-Heq we neda me tu car tu heq
Hezar salan kirin xizmet dîsa go neyarê eñmeq
4. Evan xelqan hema herkes hev dikuştin mane bêkes
Di dunya da çîqa herkes çê nabit dewleta bêkes
5. Ji mezinan gelek rabûn kirin xizmeta vî dînî
Bedî'uz-zeman wek misal e ew 'alimê 'eşra hane
6. Şeyxê delal Şeyxê Palo ma çi kir bû ewî gelo
'Idam kirin wan bê dînan ji bo xatirê pîçê kero
7. Gerek hebû bêdîn diraz dîn tune bû mîna beraz
Gote meznan werin em hûn çêken dewlet bibin yek ro
8. Ne dîn hebû ne îman lê çû Parîsê kurê Xarsê
Emir anî ewî pîsê go rakin 'ilm û medrese
9. Van 'ilm û medresan rakin jinan bînin pê reklam ken

Serpoş bînin serê wan ken tamam eḥkaman xirab ken

10. Van neyaran zûlmek we kir di şevêk da ‘ilim rakir
Ḥerfan anîn van pê nekir cahil anîn cihê wan kir
11. Bi herfan wan inqilab kir tamam ‘aliman ‘idam kir
Mîr û şeyx û mervê mezin bi zorê neyar aha kir
12. Qetlu‘amek wişan şiddet di şevêk da hezar millet
Celadan tev serî birîn dane zanîn ka cih millet
13. Ehaliyê feqîr û feqe hemyan bînin bikin ‘ebde
Eva hurîyeta jinan tazî kirin illa şert e
14. Papa go eşem le wî min eva eşqer birayê min
Rakin heyfê ji dîndaran da ku xweş bit birînê min
15. Ilahî ya Xudayê min tu dizanî niyeta min
Gelek guneh ji min çêbûn li mirnê wer hewara min
16. Min divêtin ez iz‘an kem ji ewwel ve ku tewbe kem
Ez we‘dê li vî can kem ku carek dî xeṭa nekem
17. Ya Rebbena tu Ğeffarî tamam gunhan dibexşî tu
Evî tûlî bibexşî tu ma qe reḥma te wê kêmbê
18. Evan hinek gunhê nepak hilanî hatim pêşî tu
Ne hêjayî ku ‘efû key ê mîna min reḥmê lê key
19. Emma kelbê vê ummetê dizanim ku tu red nakî
Ji bo xatirê Ḥebîbê xwe ji derê xwe tu red nakî
20. Hezar caran hezar şed car ez im tûlê derê şivan
Ku şivanê min Muḥemmed hezar caran ser im qurban
21. Ya Ilahî ya Huda‘î tu î Qadir fî kullî ḥal
Bi luṭfa xwe min xilaş ke ya mu‘în û ya zul-celal
22. Ez ê kem gazî Çar-yaran rica kem ya Ḥesen Ḥuseyn
Ez im kelbê ba pîrê we parçek reḥmê li min ken hûn
23. Temam eşḥab ricakar im li wî min hûn neken ixrac
Her çar imamê mezḥeban werin imdad ez im muḥtac

24. Imam Eş‘er Weysul-Qeran⁴⁶ Imam Menşûr hûn nuşret ken
Bi hürmeta wan ƣerîqan tu red nekey li min yek an
25. Bi hürmeta şahê Neqşî tu van gunhan li min bexşî
Bi hürmeta wan murşidan bigrin dest im bîne ser rê
26. Bi hürmeta van ‘aliman xilaş bim ez ji van gunhan
Bi hürmeta muşenifan digel ‘aşiq û me‘şûqan
27. Bi hürmeta dêyû baban ku Cennet e li bin pê wan
Bi hürmeta alê Resûl li wan deran nebim mehzûn
28. Ilahî ya Xudayê min dema bêt weqtê mirna min
Meni‘ bike ji min mel‘ûn izîin bide zimanê min
29. Ku bibêje ji dil şehde tê pê can bit cesedê min
Ku îman pê kamil dibit dê çî xweş bit mezarê min

16. (Heqê Xortê Zeman da)

1. Weqtê da û baban digote zaran
Canim feda bit ji we ra ne
2. Xweşiyû başî jê nebe şaşî
Bike cihadê nebe ê paşî
3. Li heqqiyê mêr be wekî Rustem be
Zana û xwenda be neke qellaşî
4. Da werin gel hev em bibin berhev
‘Izzet û şeref ji bo we edeb
5. Li hev hişyar bin [...] xortê baş
Heyat û xweşî ye ji bo we edeb
6. Ev saz û caz û xummar û qehwe
Qeṭ nehêlan li me heyya û edeb
7. Nehêlan gîret eva ha ‘adet
Jin û xuşkê⁴⁷ xwe tu bîne carek

⁴⁶ Di serdema Hz. Muhammed de jîyaye, lê wî nedîye. Ji Yemenê ji gundê Qeranê ye. Beyî ku pêxember bibîne bûye Misilman. Ji bo ku Hz. Muhammed bibîne diçe Medîneyê, lê ji ber ku dîya wî jê re gotibû ger tu wî nebîne vegere. Beyî ku pêxember bibîne vedigere malê. Li ser vê yekê Hz. Muhammed wesîyet dîke û jê re xirqeyê xwe dihêle. (Pala, 2004, r. 487.).

⁴⁷ Xuşkê.

8. Em dansê ken rabin reqşê ken
Wekî qewmê pîs gel hev bin
9. Xortên zemanê dema tîn malê
Serxweş û bêheş dikeve xarê
10. Dizivire malê wekî dewar
Dê û babê xwe tavêje ber pê
11. Wuşan tê heddet wek qewmê Rustem
Dibêjin aha ez rabim ji ha
12. Dê were kalê ez werme xarê
Serê te lêxim li wê dîwarê
13. Dê bîne keftor tu pê ra pişt e
Qor ez mame lêre mam bê pere
14. Babê derdê xwe jê ra beyan kir
Bi dîn û îman me nîna guman
15. Lew hat û şiddet nîne me‘ ziret
Çira derew kir hêja we mêj kir
16. Ka bîne xanim qurbanim canim
Bê pere maye ev qehreman e
17. Min nîne pere serweta min ev e
Çend qurûşê min heye kefenê me ye

[TEMET]

Medh û sena ji bo Xudayê zul-celal be. Selat û selam li ser resûlê ku dawiya pêxemberan e bit. Dawî hat li nivîsandin û serrerastkirina {teshîh} *Dîwana* ‘alimê ‘amil Seyda Mela Enwer Ovanisîyê Karçikanî li ser destê ‘Ebdulhadî kurê Mela Se‘îd Ovanisî roja duşemê di duwê meha Recebê sala hezar û çar sed û çil [û] diduwê hicrî {2-Receb-1442 h.-15-2-2021}[de]. Daxaza me ew e kesê lê binêri bixûne eger kêmasîyek hebî bila pênuşa çêkirinê li ser da bigerîne. Xudayê te‘ala me ji xêr û bereketa sadatan bêpar neke, di dunyayê da xweşîyê bide me, di axretê da jî xweşîyê

bide me, ji agirê Cehennemê biparêzi. Me û dê û babê me daxilê Cennet'ul-Firdewsê bike, amîn.

NAVEROK {FIHRIST}

Destpêk

Heqê Gunehan da

Li Ser Muḥammed Eḥmed

Heqê Dinyayê da

Li Ser Ḥalê Xwe

Heqê Seydayê Xwe da

Teleba Şefa 'eta Resûlellah

Fîxana Bal Fexrê 'Alemê ve

Li Ser Ḥalê Xurbetê

Heqê Nûra Xuda da

Li Ser Ḥalê Miletê Bêkes

Li Ser Qelbê Zelal Hevalê Taze

Heqê Miletê Mezlûm da

Heqê Mezlûman da

Heqê Xortê Zeman da

Ellahumme sellî 'ela Muhemmedîn we 'ela alî Muhammed. Kema selleyte 'elâ İbrahîme ve 'ela alî İbrahîm. İnneke hamîdun mecîd. Rebbena eteyna fîd-dunya heseneten we fil'axiretin heseneten we qîna 'ezaben-nar, amîn. Mudewwen: 'Ebdulmuzzenib 'Ebdulhadî.⁴⁸

⁴⁸ Ev du'ayên bi Erebî jî piştî beşa temetê hatine nivîsîn.

ENCAM

Mela Enwer melayekî Bedlîsî ye wî ji di bin çanda medreseyê de perwerdeya xwe girtiye. Bi pazdeh salan li gundên cuda melatî kiriye û di sala 1985an de koçî bajarê Edeneyê kiriye û li vir jî bi awayekî fexrî pazdeh salan melatî kiriye. Mela Enwer xwedî dîwançeyêkê ye û di vê dîwançeyê de 16 helbestên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn hene.

Di helbestên wî de em rastî bawerîyeke xurt ya ji bo Xwedê û pêxember tên. Herweha rexneyên tund li dijî serdema modern, dijminahîya li dijî dînê Islamê û nebûna şerî'etê dike.

Di helbestên wî yê serê dîwançeyê de bêtir alîyê wî yê dînî derdikeve hemberî me. Lê di helbestên wî yê dawî de hizreke neteweyî jî xwe dide der. Mela Enwer ji ber nebûna dewleteke Kurd û nebûna yekbûna Kurdan, rexneyên tund dike. Herwiha serdema Atatürk û kanûnên ku di wê serdemê de hatine qebûlkin jî ji rexneyên wî bêpar nemane. Tê dîtîn ku di helbestên wî de seydayên wî û postnişînên terîqeta Neqşebendîyê jî cihekî mezin girtine.

Dîwançeya Mela Enwer ji 16 helbestan pêk tê, ev helbest ji tîpên Erebi ber bi tîpên Latîni hat veguhestin û li gor alfabeya transkripsiyona ya navneteweyî hatin nivîsandin. Herwiha bi kurtasî derbarê jîyan û berhemên Mela Enwer de agahî hatin dayîn û li gorî van agahî û helbestên wî derket holê ku Mela Enwer jî yek ji edîbên medreseyê ye û şairekî ku bi terza klasîk helbest nivîsîye.

Mela Enwer di helbestên xwe de mexles bi kar anîye wî di helbestên xwe de navê xwe weke mexles bi kar anîye. Wî di helbestên xwe de bi tevahî 29 caran mexlesa xwe bi kar anîye û di helbestên rêza 5,10, 12, 15 û 16an de mexles tune ne.

Mela Enwer ji edebîyata Kurdî haydar e û ji vê edebîyatê îstîfade kiriye, wî di helbestnivîsîna xwe de di bin tesîra Feqîyê Teyran û Harisê Bedlîsî de maye.

Dema em li helbestên Mela Enwerê Ovanisîyê yê Karçikanî mêze dikin em rastî teşeyên weke; mesnewî, qesîde û xezalan tên. Mela Enwer di dîwançeya xwe de

cih daye çar mesnewî, du xezel û neh qesîdeyan. Helbestek jî ji ber ku di serwaya wê de hevgirtinek tunebû û tê de şikestin hebû cureya wê nehate dîyarkirin.

Mela Enwer di helbestên xwe de hunerên edebî bi kar anîye, di dîwana wî de hunerên weke; teşbîh, tekmih, teraduf û hesabê ebcedê tîn dîtin.

ÇAVKANÎ

ADAK, Abdurrahman, “Mexles di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de”, **Nûbihar Akademî**, hejmar 10, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2018, n.r.11-58.

ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanxaneya Nubiharê, Stenbol 2015.

ADAK, Abdurrahman, **Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ua Klasîk de**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019.

CÎHANÎ, Perwîz, **Leyla û Mecnûna Sewadî**, Weşanxaneya Sîtav, Wan 2021.

CÎHANÎ, Perwîz, **Mem û Zîn Ehmedê Xanî bi Lêkolîn û Şîroveyeke Nû**, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2010.

DEVELİOĞLU, Ferit, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, Aydın Yayınları, Ankara 2003.

ENWER, Mela, **Dîwana Karçikanî**, (Amadekar: ‘Ebdulhadî.’), ?, 2021.

KARAK, M. Zana, “**Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2020

KOCAKAPLAN, İsa, **Açıklamalı Edebî Sanatlar**, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, 9. Baskı, İstanbul 2017.

MERMER, Ahmet, Sebahat Deniz, Yavuz Bayram, Lütfi Alıcı, Muvaffak Eflatun, Neslihan Koç Keskin, **Üniversiteler için Eski Türk Edebiyatına Giriş**, Akçay Yayınları 11. Baskı, Ankara 2014.

NURSİ, Bediüzzeman Said, **Tarihçe-i Hayatı**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2004.

PALA, İskender, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı Yayınları, İstanbul 2007.

SADİNÎ, M. Xalid, **Feqîyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî)**, Weşanxaneya Nûbihar Çap 8, Stenbol 2014.

SARAÇ, M. A. Yekta, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkuşbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014.

Yakup Aykaç, “**Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar,) Çewlîg 2015.

Eş-Şeyh Muhammed Maşuk Norşini (K.S), Râh-i Aşk,
<http://www.rahiask.com/index.php/tetebbuat/126-naksibendiler/tahiler/631-es-seyh-muhammed-masuk-norsini-k-s> (Dema gihandinê: 04.01.2022)

Hevpeyvîn

Hevpeyvîna bi Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî (09.01.2022)

PÊVEK

Pêvek 1: Rûpela Yekem ya "Dîwançeya Karçikani"

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

الله وَاِحْدُ اَحَدُ عَالَمِ حَمِي تَه چيكر
تو بي مثل ظهير عرش كزسي ته چيكر
مرن رابين دي هيت مينا جنة جهنم
حشر نشروك ميزان عمل وي بينه كيشان
تو صنایع مخلوق مدخ ثنا ربو ته
محمّد حبيب نيه صلاة سلام لسر به
دگل آل اصحابان دگل ای گو بن تابع
دگل ای گو بظانن حق عدالت تابع
حقی عمل وان باشه بلطفانه الهی
دبه شافع محمّد دابوز دین وی الی
او عمل تفنیح به حال وان پزخرابه
زبانن دکن گازی ایرووه حال خرابه

بَابِ دَرْدِي خَو ژِيرَا بَيَانِ كِرْ

بَدِيْنُ اِيْمَانِ مَه نِيْنَه گَنومان

لَوْهَاتُ شِيْدَتِ نِيْنَه مَعْرِزَةَ

چِرَا دَرُو كِرْ هِيْزَا وَه مِيْرُ كِرْ

كَا بِيْنَه خَانِيْمِ قُرْبَانِيْمِ جَانِيْمِ

بِي پِرَه مَائِه أَفْ قَهْرْمَانَه

مِنْ نِيْنَه پِرَه سَرُوْتَا مِنْ أَفْه

چَنْدُ قُرُوْشِ مِنْ هَيِه گَفْنِ مَيِه



أَخَاهُ نَبَاهِيَّةَ

ملا انور كور حياي عزيز
حياي الياسي حياي احمد
ملا دروشي قاضي ملا عبد الله
ملا محمد آقار ملا علي
ملا عبد الله خر خوردة ملا عبد الرحمن
ملا دروشي ملا زاده قاضي
ملا احمد قاضي ملا حسين
ملا شبلي مههور حياي احمد
شيخ محمد شيخ يوسف
شيخ محمد هادي
سليمان كور حال كور
ولد

Pêvek 4: *Fotografê Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikani*



Pêvek 5: *Fotografekî din ê Mela Enwerê Ovanisî yê Karçikanî*





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Projesi

OVANISLI MOLLA ENVERİN “KARÇIKANÎ DİVANI”NIN LATİNİZE EDİLMESİ

Seher BİŞAROĞLU
20721006

Danışman
Dr. Shahab VALÎ

Mardin-2022